

K.T.
ZANÎGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

XERÎBÎ LI HELBESTÊN HÊMIN Û SEYYAB

TEZA LÎSANSÂ BILIND

Amade
Yaseen Alî Mahmood

VAN-2017

T.C
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

YÜKSEK LİSANS TEZİ

HÊMIN VE SEYYAB'IN ŞİİRİNDE GURBET

Hazırlayan
Yaseen Alî Mahmood

DANIŞMAN
Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ



T.C.
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ danışmanlığında, Yaseen Ali Mahmood MAHMOOD tarafından hazırlanan “Xerîbî Li Helbestên Hêmin û Seyyab De” adlı bu çalışma, 21/08/2017 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı’nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan(Danışman)	: Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ	İmza:
ÜYE	: Doç.Dr.Vecihi SÖNMEZ	İmza:
ÜYE	: Yrd. Doç. Dr. İbrahim SÜRÜCÜ	İmza:
ÜYE	:	İmza:
ÜYE	:	İmza:

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylım.

Prof. Dr. Murat DEMİREL
Enstitü Müdürü

NAVEROK	
NAVEROK	IV
Pêşgotin	VI
KURTKIRIN	IX
1. Destpêk.....	1
1.1. Pênaseya Xerîbîyê	1
2. RÊBAZEKANÎ HELBESTVANÊN BIYANÎ	7
2.1. Rêbazekanî Helbest	7
2.1.1. Rêbaza Hegel Di Xerîbîya Sîyasî De	7
2.1.2. Rêbaza Marks Di Xerîbîya Civakî De.....	8
2.1.3. Rêbaza Fîorbax Di Xerîbîya Ayînî De	9
2.1.4. Rêbaza Xerîbîyê Di Îslamê De.....	9
2.2. Xûrbetîya Giştî Rewşenbîran û Taybet A Hozanvanan.....	12
2.2.1. xerîbî hozanvana	12
3. CORÊN XORBETÎYÊ	15
3.1. Xerîbî Beramber Mirovan	15
3.2. Cureyên Xerîbîyê.....	16
3.2.1. Xerîbîya Civakî.....	16
3.2.2. Xerîbîya Fikrî	17
3.2.3. Xerîbîya Şexsî, Xweyî, (Ezî)	18
3.2.4. Xerîbîya Ayînî (Olî).....	19
3.2.5. Xerîbîya Coxrafî.....	20
3.2.6. Xerîbîya Aborî	21
3.3. Xerîbîya Wêjeya Cîhanê	22
3.4. Xerîbî û Wêjeya Kurdî	27
3.5. Berhevkirina Xerîbîya Her Du Helbestvan	38

3.5.1. Jin le hizru bînîa hêmin u seyab	43
3.5.2. Xwendin û Rewşenbîrî	45
3.5.3. Di Meydana Jîyanê De	47
3.5.4. Nexweşî û Koçkirin	48
3.5.5. Bihayê Hestan	50
3.5.6. Wêneyê Helbestan.....	56
3.5.7. Zimanê Helbestan (Hunrawan) Zimanê Rêzikên Helbestan.....	57
3.5.8. Helbestvan Di alîyê Gohdarvan De	60
3.5.9. Xerîbî û Behsa Xwezayê Li Cem Herdu Helbestvanan	63
3.5.10. Destnîşankirina Hêmin di Helbestên her du Helbestvana de	65
3.5.11. Zimanê Helbestan Li cem Seyab û Hêmin.....	67
4.WÊNEYÊ HELBESTAN	68
4.1.Wêneyê Helbest kêşan	68
4.2. Fikrên Rexnegirina Li Ser Têgehiştina Wêneyên helbestan.....	68
4.2.1. Wêneyê helbestan li gorî gelek rexnegiran pêktê ji	69
4.2.2. Fikrê rexnegiran li ser pênaseya wêneyê Helbestan	69
4.2.3. Rêgezên Wêneyê Helbestan	70
4.2.4.Efsane	71
4.2.5.Wêneyê Helbestan Di Helbestên (Seyab û Hêmin) De	72
Encam.....	79
JÊDER.....	81
Özet tez.....	86
ABSTRACT	89

Pêşgotin

Berhevkirina wêjeyî wekî beşekî girîng ya zanîsta wêjeyê ye, Di rexneya wêjeyê û ya hevçerx de taybetmendîyê xwe heye. Ji ber ku Berhevkirina wêjeyê alîyekî girînge ji bo bal xistina ser şêweyê wêjeyêye.

Hêmin û Seyab wekî du helbestvanê binav û deng yê wêjeya kurdî û erebî ya hevçerxin. Di alîyên xerîbî de çendîn xalên hevbeş hene. Bi şêweyekî afrêner corên xerîbî di nava mijarên wan de derdikevin. Me ev corê babetê ji bo lêkolîna xwe hîlbijartîye, ev xerîbî jî bi hestkirina deronî ye. Di encamê de derdikeve holê ku, mirov, xêzan, civak û welat bi van corê xerîbîyê di helbestên Hêmin û Seyab de dîyar dibin. Ji ber ku her du jî çend salan ji derveyî welatê xwe jîyan kirîne, ji ber sedema sîyasî bû. Hêmin ji ber hizra neteweya xwe û welatê xwe ji bajarê Mihabatê derketîye. Seyab jî ji ber hizra qewmî û welat ji bajarê Ebu Xesîbgundê cêkor ku girêdayî parêzgeha Besre ye derketîbû. Ev corê durketinê bû sedemê derketina xerîbîyê di nava helbestên wan de. Me jî baş zanî em di vê derbarê de vê lêkolînê binivîsin.

Ev Teze ji destpêkek û sê beşan pêkhatîye. Beşê yekem ji bo pênase û beşan hatîye dîyarkirin. Me di nav de beş û pênaseya çîrokên xerîbîyê pêşkêş kirîye. Her wiha di vî beşî de, di mijara duwem de beşê berhevkirina dibistanan hatîye dîyarkirin. Di mijara sêyem de jî min jîyan nama her du hunermenda xistîye weznê de. Min berhevkirina wan derxistîye di alîyê cîyawazîya wan di beşê sêyem de. Corên xerîbîyê di nava helbestên Hêmin û Seyab de hatîye eşkerekirin. Di heman demê de li ser armanca sedemên derketina corên xerîbîyê jî hatîye eşkerekirin. (Civak, hêz û ranyarî) jî tê de dîyar bûye. Her yek ji van corên xerîbîyê sedemekî xwe yê taybet heye.

Ji bo nivîsandina vê lêkolînê min her du rêbazên wesif û şîroveyê bi kar anîye. Her wiha ji bo bi serxistina pirojeya lêkolînên min berhevkirina pirtûkxaneya Emrîkî bikar anîye. Ji bo bi destxistina corê afirandinê û ciwanîya mijarê pêwîstî bi wêjeya cîhanî hatîye dîtin. Ji ber ku di nava van her du hunermendan de qet bandora hev

naskirinê nebû. Bi hêvîme ku ev Teza min berhevkirina hunerî a wêjeyî dewlemendtir bike.

Bê goman (Xerîbî) girîngtirîn û naziktirîn heste di nava helbestên Hêmin û Seyab de. Ji alîyê kesan ve girîngîyek baş a akamdemî û lêkolînê ji bo hunera Hêmin û Seyab ne hatîye dayîn. Kêmbûna çavkanîyan a di derbarê babeta min de.

Ev her du pirsgirêkên herî dîyarin. Di nava hemu alîyên lêkolînan de derdikevin holê. Em tekoşînê dikin û hewildanê dikin ji bo çareserkirina van pirsgirêkan. Emê di vir de bidîn eşkerekirin ku Hêmin û Seyab helestvanên di singê xwede xwedî sozin. Xerîbîya wan jî ewe ku herî zêde dewruberê xwe dîtine. Ev jî di jîyana wan de eşkereye û di rêya helbestên wan de hatîye dîyarkirin. Pêwîstîya wê jî bi hurbûnekî kure ji bo eşkerekirina wezna helbestan. Her wiha ev babet pêwîstîya wê bi wergirtina zanyarîyên zêde heye, di alîyê şêwe û naverokê de.

Yaku bihayekî rast dide her lêkolînekê wekî li jêr me dayî dîyarkirine: Tezek li ser ne hatîye çêkirin. Di wê bawerîyê deye ev babetekî nûye û lêkolînan bi westanekî zêde geştiyê. Ev teze gewherîye di corê xwe de. Ji ber ku di demê pêşde lêkolînek bi vî awayî li ser ne hatîye kirin. Girîngîyekî din jî ku pêktê ji hewildanekî jibo eşkerekirina alîyek din di helbestên Hêmin û Seyab de. Ew jî (Xerîbîye) (Namûyî) cîyawazêyên taybet di nava xwe de digire. Bi şêweyekî giştî bandora (xerîbîyê) di jîyana helbestvan de. Bi karanîna derbirînê di jîyana taybet de. Yan jî ew rewşên tê de derbas bûne. Jîrî û zîrekîya helbestvan piştgirîya min bû ji bo birîna bêçareyîyê. Karekî giran bû ji bo gehandina vê karê min bi vî awayî li ber destaye.

Girîngtirîn encama di vê tezê de pêktê ji: Eşkerekirina alîyê deronîya helbestvan û bandora derketina xerîbîyê di helbestên wan de. Şirîvekirina rêzikên helbestan, dîyarkirin û destnîşankirina wan rêzikên xerîbîyê. Xizmetkirina helbestvan di, destpêka temende bi şêweyekî taybet. Ji bo cîhana wêjeyê û rewşenbîrîyê bişêweyekî giştî. Agahdarkirin yan jî bamgkirina her kesekî ku armanc wan biçe di nava van alîyan de. Yan jî eşkerekirina alîyên helbestên herdû helbestvanan Hêmin û Seyyab. Şayenê behskirinê çend sedem hene ku ji bo ez hizra vê lêkolînê bikim

(Taseyî û xerîbî di helbestên hêmin u seyb) de, pêktê ji: Kesayetîya resen a helbestvan. Kesekê awriek li van dîyardeyên helbestvanan ne daye û dîyarkirin û eşkerekirina helbestên dîwana wan ne daye. Min ev lêkolîne hilbijart, ji ber ku min gelek xerîbî kêşaye dîtiye. Di gelek karên wêjeyî û helbestan de xuyakirina hêza xerîbîyê di felsefe, deronî, civak û sîyasetê de derdikeve. Çuye di nava civaka mirovatîyê de, Di hemu serdem û civakan de wekî rastîyekî berçav bi mirovan ve hatîye naskirin. Di destpêka çêbûna kombûna mirovan de hinek pirsgirêk bûne sedemê xerîbîya hinek kesan. Herî zêde tê xuyakirin ku ev rewş di serdema nû de derdikeve holê.

Di dawî da Ez pir spasiyan mamosteyên hêja û rêzdar ên beşê zimanê kurdî li Zanîngeha Yüzüncü Yılê dikim ku bi kedr û dilsoziyeke herî mezin bi me re westiyan. Her wiha ez pir sipasiya **Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ** dikim ku erkê serpereştîkirina vê lêkolînê li milî xwe girt. Her wisa vê xebatê pêşkêşî ruhê bavê xwe, diya xw dikim gelek alîkarê bi min kirîfe.

Yaseen Alî Mahmood

Van 2017

KURTKIRIN**Amd : Amadekar****B : Berg****Ç : Çap****J : Jimar****C : Cild****Ko : Kovar****R : Rûper****T : Tercume****Wer : Werger****Weş : Weşanxane****s.l.x : Silavên xudê lêbin****d.n. : dîwanî nali****d.h. : dîwanî hêmin****d.e.x. : dîwanî ehmedî xanî (mem û zîn)**

1. Destpêk

1.1. Pênaseya Xerîbîyê

Zarevayê xerîbîyê, lêkolîn û çavkanî li ser vê babetê bi asanî bi dest nakeve. Tenê çend corê xerîbîyê ê berçav bi dest me dikeve. Xûrbet heyînekî kevne li gel mirovatîyê derketîye holê.

Peyva Xerîbî, wesfeke ji bo wî kesîye ku hest dike li gel derdora xwe na goncêt. Her di destpêka civakê de xerîbî derketîye. Pirsgirêkên cuda cuda yên xurbetîyê bal kişandîye ser mirov, ev jî di çend alîyan de tê dîtin. Xerîbîya (Welat, Ol, Civakî, Coxrafi û Ramyarî).

Di zimanê Erebî de zarevayê (Axtrab- Xerîbî) ji (Xerb- îxrb Axtrb- Axtraba) hatîye wergirtin. Peyva xûrbet bi wateya awerebûn yan jî koçber bûn tê. Li gorî Rîşard Şaxt " Xerîbî tê wateya têkçûna aqil, ji ber ku di zimanê latînî de bi wateya ji destdayîna hiş tê. Îxlîcî, ji karketina hêza aqil yan jî hestên mirovan tê "¹

Gelek ji mirovên kurd bi tayber rewşenbîrên kurd corên xûrbetîyê kêşandîne. Gelek corên cuda dîtîne. Sedemên vê xûrbetîyê jî gelekî, ketina rewşenbîran a di nava şoreşê de bûye sedemê durketina wan ya ji welat. Ketina wan yan di nava jîyanekî nû de. Pêwîste em du xalan bidîn destnîşankirin û lipêşîya xerîbîya rewşenbîrane: Ya yekem peywendîya wan bi babetên azadî desthilatîya sîyasî û civakî ve heye. A duwem jî peywendîya wan bi rewşenbîrî û pirojeya netewî ve heye.

Gelek nivîsin li ser derbarê zarevayê xerîbîyê heya niha eşkere nîne. Tenê ya ku li berçave, cîyawazî û dijayetîya wan nivîsînên di vi derbarî de hatî nivîsandin, gehîştîyê wê radeyê xwendevan wisan hîs bike " Ku behsa çend beşên cuda dike. Ev jî di encama wê deye ku her kes li gorî fêmkirina xwe ev beş bi kar anîye "²

¹Rîşard Şaxt, *el-Ixtirab*, weş, el-î lim, beirut, 1979, r, 123. Kamil Yusif Hisên, *el-Qissetu'l-Erebiyye*, ed-Dirasat we'n-Neşr, Beyrut, 1980, r, 311.

²Xiyaseddîn en-Neqşebendî, *Namoyî*, Çapxaneeya Bedirxan, Ç.2, Silêmanî, 2004, r, 43.

Helbestvan ji hemu kesan zêdetir rastî êş û derdê dinava civakê de tê. Ji ber ku hestekî zêdetir heye, ji ber vê jî herî zêde xurbetî bi ser helbestvan de tê. Di îslamîyê de jibo me eşkere û dîyare beşê xûrbetîyê di fermana pîroz a Pêxber Mihemed (S.L.X.) de hatîye.³ [بدأ الإسلام غريباً وسيعود غريباً فطوبى للغرباء]³ Tê wateya Misilmanan bi kemînê destpêkirin, jimareyek kesên xerîb di nava bê bawerande dijîyan. Bi hema şeweyî îslam dizivire wekî destpêkê. Xerîbî herî zêde rewşekî deronîye rastî mirovan tê. Piştî wê jî ji xwezaya civaka xwe dur dikeve. Yan jî di nava gel, kesên derdora xwe û di nava civaka xwe de hest bi ne guncawbûna fikre bike. Di vir de " Kes rastî windabûnê tê, hest dike nikare bi şeweyekî giştî daxwazê hevîyên xwe ê wekî Bi xwe dixwaze nubûnê lê bike. Herdem ew di dil de tengîyê dikêşe wekî ku di vê cîhanê de cihê wî nabe û hest bi sistîyê dike."⁴

Ev corê xerîbîyê belkû ji bo pêkhatiya xerîbîyê bê gohertin. Wisan metirsîdartire" Ji ber ku ev corê xerîbîyê di wan kesan de derdikeve ku hest bi windabûna jîyana kesan yan jî yaxwe dike. Çend peywendî di nav deye rê nade bi zivire "⁵

Xerîbî wateya xwe ji xorbetîyê girtîye. Pêktê ji wan kesan ku ji xêzan û hozên xwe dur ketîne. Xerîbî gelek zore, hemû kesek nikare cilê xerîbîyê hilgire. Ji ber ku xwedî soz û sozdarîye mirove, wisa dixwaze mirovê xerib sebri hebêt li hember arîşeya jîyanê her weki peyva xurbe d nave ferhenga eyn) ya ferahdida hatye nvisin"

(الغربة الاغتراب عن الوطن، وغرب فلان عنا يغرب غربا , واغربته غربته اي نحيتة , والغربة

النوى البعيد⁶

Her wiha peyva (Xerb) di ferhenga lîsan ya erebî a İbn Mensor de bi vî awayî hatiye:

³Mihemed Nasraddin Alabanî, Sihsnan mace, *Aşktbe Alsalmeye*, Beyrut, 1986, 363.

⁴Yusuf Osman, Deronzan, *Witar û lêkolînewey Şikarî*, Hewlêr, 2000, r, 144.

⁵ Qeys Al nurî Alxtrab Asklae Haw mxhuma waqea, *Mcle Alm Alfkr*, Mclid Aleşr, 1979, r, 33.

⁶ Ebu Ebdrehman Alxlîl Bn Ahmd Alfrahûd, Ktab, *Elen*, Tehqîq, Alşqafîye, 1986, r410- 411.

الذهاب والتنحي عن الناس وقد غرب عنا يغرب غربا , وغرب وأغرب تغريبا : النفي عن البلد ,
والغربة والغرب : النوي والبعد , فيقال غرب عن الارض وأغرب اذ امعن فيها , والغربة والغرب (بضم الغين)
والاغتراب والتغرب:النزوح عن الوطن⁷ ”

Xerîbî pêktê ji" Mirov ji xwezayekê diçe xwezayek din. Bi corekî peywendîyekî rihî di nava singê wî de be"⁸

Mirov dema bi tenê be dikeve di nava hizirînê de. Êdî ev hizirîne gelek caran di gehe " radeya pirsyarên kevin ku cîhan di nava xwe de bigire. Lê belê bersivêkî bi bawer dest biwan nakeve, hinek caran jî rastî acizbûna xerîbîyê tê"⁹

Xerîbî pêwîstîya wê bi aramîyekî gelek heye. Ji ber ku bi tenêti " Xerîbî sebrê dixwaze rastî kesê neyê. Bi taybet kesê ku xwendinê ji bo xwe dihilbijêre yan jî ji bo ticaretê diçe cihekî, wekî me jê re ne hatibe qedexekirin. Mirov dema welatê xwe bicih bihêle wekî rêyek dur û dirêje. Lê belê xurbetî îcbarekî girane "¹⁰

Gelek caran mirov ji civak û nîştîmana xwe dur dikeve û rastî hestên xerîbîyê tîn. Yan jî rastî nexweşîyê tê " Di vê rewşê de eger mirovekî xerîb kesekî rewşenbîr yan jî wêjeyî be wê demê xerîbî bandorekî zêde li ser hizir û deronîya wî dike.¹¹

Îdward Seîd, di derbarê vî corê xerîbîyê de bi vî awayî pênaseya xerîbyîyê nivîsandîye. Xerîbî wisan dike mirov xerîb û koçber be di jîyanê de. " Ji ber ku li gel derdora xwe a nû bi temamî na sazê, ne bi temamî ji bûrîyê xwe xilas dibe. Nivîya wî geşte û nivîya din jî koçîye. Di alîyekê hesreta nîştîman di kişîne û di alîyê din de jî xwe nîşa kesên derdora xwe dide. "¹²

7 Ibn Menzûr, *Lîsanu'l-Ereb*, Daru Sadir Beyrut, 1956, c3, r, 637-639.

8 Serkewt Bûnconî, "Xurbet le Şiirî Nwêy Kurdî", *Raman*, Hj. 48,2000, r, 51.

9 Serkewt Seîd Qadir, *Namoyî Le Romanekani (Selah Eumer) da*, weş,selam, Hewlêr, 2011.r,22

¹⁰ Hevdîtin Legel Mamosta Ebdula Hisênzade, Şemme, 23,4,2016, Seet,9, beyanî.

¹¹Muhemed Salih Ebdurehîm *Namoyî Le Şiirekani Rostam Bacalanî Da*, weş,rêga, 2013, r, 10.

¹²Edward Seîd, "Namoyî Ronakbiran", *Kovarî Gelawêj Nwê*, hj.45,weş,serkewt,1998, r ,10

Xerîbî rewşekî birînekî di navabera mirov û xelkên din deye. " Ev rewşe bi şêweyî hişyarî yan jî bê hişyarî çêdibe. Piştîre dibe encamên wê aktîv be ev jî wisan mirov dike berbi rizgarbûnê ve biçê. "¹³

Hinek caran xerîbî tê wateya durketinê. Yan jî tê wateya durxistin yan koçkirina wan ji niştîman, kesûkar û heskirîyên wan. Xerîbî ezmûnekî mirovî ya êş bexşînê ye. Her wiha tê wateya durketina ji xelk û welat. Xerîbî gelek caran êş bexşe dema mirov ji niştîman û welat dur dikeve, ev durketin jî ne bi xwestek be, xerîbî wekî îşkencê tê. Mirov çî ji durketina welat çî jî durketina ji lehîstokên zarokatîyê hemu hilgirtina dildarîyê ye. Xerîbî di hemu serdeman de derdikeve. Lê belê tenê di yek şêweyê de dernakeve kû ew jî dibe çend şêweyek: " Sedemên çêbûna wê dizivire ser du tiştan, yek rewşenbîrîya mîlî, a duwem jî zêdebûna bicîhbûnan. Lê belê peyva xerîbîyê çend wateyên xwe hene. Ev jî hestkirina bi êş ya di nava singê mirov de. Em dikarin bêjin mirov dibin du cor: Kêmasîyek bi temamî dikare çareserîya xurbetê bike, lê gelekî jî nikare ji ber bêhêziyê " ¹⁴

Helbestên ji bo vegotina hestên hozanvane û tê de xemên xwe direvîne. Ji ber vê jî Ebdûlayê kurê Rwahe di derbarê helbestê de dibêje : " An eşer şî yxtlc fî sdrî fîntlq be lsanî "¹⁵wate:Hestkirin beşekî singê min di livîne û di devê min de derdikeve. Di dirêjahîya dîrokê de helbest wêneyê dil tengî û xûrbetîya komek helbestvana bû. Lê belê ev nayê wê wateyê ku wêneyê babetekî di hemû serdeman deye. Belku ji serdemekî heta serdemekî din tê gohertin." Şêweyê xûrbetîyê li cem helbestvanê ciwan ronî û hêsanî têdeye. Berhevkirina rewşa jîyana xwe a ciwantî, dibe wêneyê rastî ê gelek helbestvanên wî serdemî. Ji ber vê " Şêweyê xorbetê ji xwe re ne hilbijartîne, belkû gelek sedemên bi hêz bi ser wande hatîne. Wekî xwezaya jîyanê, jîyana ladî, zagonên hişk û sedemên aborî. ¹⁶

¹³Edward Seîd, "Namoyî Ronakbiran", 1998, r. 12 .

¹⁴Kamil Yusif Hisên, *el-Ixtîrab, yel-Qissetu 'l-Erebiyye*, ed-Dirasat we'n-Neşr, Beyrut, 1980, r.49 *Rîşard Şaxî*, el î lim 1979 ,r.322

¹⁵Ibn Ebd Rebbih, *el-Iqdu 'l-Ferîd*, Daru Nesr, Dimeşq, 1980, V, 128.

¹⁶ Kamil Yusif Hisên-Mahir Hasn Fhmî, *el-Henîn we 'l-Xurbe fi 'ş-Şiiri 'l-Xerbiyyi 'l-Hedîs*, Daru Nesr, 1981, r. 47.

Dema em dibînin komek helbestvan hest bi xorbetî û nîştîmanê dîkin, heyînekî xwezayîye. Durketina ji nîştîman wekî têbînîyekê di hestên Abn Mlhm Alxzaeî, di helbestekî sozdarîyê de rêdike ji bo nîştîman û zarokatîyê.

افي كل عام غربة ونزوح اما للنوى من ونية فتريح

¹⁷Dihemî sala xurbet u cihê tune mirin nayet binêre u derbaz bim,

Mirov hinek caran bi xerîbîya xwe jîyanê berdewam dike. Xerîb bûn armançeke di rewşekê de " Mirov bi xerîbî jîyana xwe dibe ser. Yan jî ji xwe xerîb dibe nikare li gel civak û derdora xwe bi şêweyekî asanî û xwezayî li gel civakê dirêj bike. ¹⁸

Gelek caran xerîbî durkedine ji kesayeta xwe. Hinek caran jî xerîbî xilasbûna kese ji civak û bi giştî retkirina hemu heyînê civakêye. Lê belê hinek caran xerîbî berfirehtir û kurtir dibe dema kesek dur dikeve ji xwezaya derdora xwe û civakê giştî. Xerîbî derketinekî negatîf a civakîye. Kes nikare li gel wan be û ret dike. Gelek caran nikare goherînê çêbike, neçare hewildanekê ji bo cîhanek din bike. Tenê bixwe rêvebir ê wê cîhanê ye. "Gelek caran kurtir dibe di gehe wê merhelê ku kes hertim ne xerîb be. Belku li dijî kesan jî be û reftarekî hişk jî bikar bîne. Ev jî wê radigehîne tundî û hişkî derketina xerîbîyê ye û qonaxekî piştî wêye. ¹⁹

Mirov dema bi tenê dimîne dikeve di nava hizran de. Êdî ev hizirîne jî di gehe merheleyekê. Lê belê bersivekî bi bawerî dest nakeve. Hinek caran jî rastî acizî û xerîbîyê jî dibe. Ya ku di vir de alîkarîya wî hizrî dike bi tenê bûna wîye. Li gorî Ferhenga Xal, xerîbî rewşekî deronîye, wateya bê xwî û bê keyfî radigihîne. Di wê ferhengê de beramberî wî kesê ku rastî vê rewşê hatî re ku kesê xerîbe tê wateya xerîb

" 20

¹⁷Mahir Hesên Fhmî, *el-Henîn we'l-Xurbe fi'ş-Şiirî'l-Xerbiyyi'l-Hedîs*, r. 14

¹⁸Aram Muhemmed Qadir, *Namoyî Le Şiirî Kurdî da, Krmancî Xwaro, 1975-2000*, Silêmanî, 2007, r. 7.

¹⁹Serkewt Seîd Qadir, *Namoyî Le Romanekanî Selah Umer da*, Hewlêr, 2000, r. 55.

²⁰Qadir, *Namoyî Le Romanekanî Selah*, r. 67.

Xerîbî heyîneke di hemû mirovan de heye. " Lê belê ji kesekê ta kesê din tê gohertin. Ev jî bi cîyawazîya di pişe, asta xwendin, palpişta deronî, civak û aborîya ku kes tê de dijî. Her wiha li ser pêkhatayen wekî Bîyolojî, deronî û tendirûstîya deronîya kes di sekine. ²¹

Tê dîyarkirin ku xerîbî di serdema niha de komek alîyên cuda girtîye, di alîyê sîyasî aborî û rewşenbîrîyê de. Ev dîyardeye di encam çend sedemên navxweyî û aqilî de tê gohertin. Ahmed Mşarî Aloadî, di vê bawerîyê deye : " Xerîbî yek ji wan pirsgerêk, qeyranê deronîya civakîye. Li jêr çend sedemên ducarê mirove. Çavkanî ûfaktura (Xerîb) di çavkanîyan de derdikeve û bandorê li ser hest, hişê kesayetîyan dike. Lê belê encama wê yeke ew jî birîna mirovane ji resentîya wan. ²²

Ne şerte ku hemu sedemên xerîbîyê ji bo fakrûrê bizivire. Ji ber ku sedemên hinek corê xerîbîyê xwedî fatûrên kesîne. Mînak; Ji xwe xerîbûn û ji hebûnê xerîb bûn xwedîyê faktûrekî nav xweyîye. Dema radeya acizîya singê mirov ewqas bilind dibe wisan lê dike hest bi xerîbîyê bike. Bi taybet jî ev rewşa xerîbîyê li cem mirovê rewşenbîr xwedî têgehiştin be.

²¹ Ahmed Mihemd Akzebî, *Ilmu'n-Nefs en-Numuw*, Daru Zehra Eman, 2002, r. 436.

²² Qadir, *Namoyî Le Romanekanî Selah*, r. 7.

2.RÊBAZEKANÎ HELBESTVANÊN BIYANÎ

2.1. Rêbazekanî Helbest

Xerîbî di hemû serdeman de heye. Lê belê bi heman şêwe dernakeve gelek dîyare û heye. Li jêr vê navnîşanê de du sedemênwê yên bingehîn hene ew jî pêktên ji : Rewşenbîrîya neteweyî û rabûna niştecihan, xerîbî hesetekî bi êş tenêti û du dilî di deronîyê de çêdike. Li ser vê bingehê em dikarin bêjin mirov du core : Hinekê em dikarin cuda bikîn hêza çareserkirina xerîbîya wan heye. Gelek ji vê hêzê ji dest dayîne. Eva ku niha derbarê xerîbîyê de behsa wê tê kirin berjengê gewherê mirovan destnîşan dike. Her wiha jîyan jî bê xerîbî nabe, ya ku divirde jî girînge hêza mirovan a ji bo çareserîya xerîbîyê ye.

2.1.1.Rêbaza Hegel Di Xerîbîya Sîyasî De

Firidrîk Hegel (1770- 1831 z) tenê ji bo azadîya xerîbîya wateyê hîlbijartî bû. Dagirkirina mirovan ji bo (Azadî) yê û her wiha cudakirina wê ji (Xerîbîyê).Li jêr xerîbîya mirovan de xebata sîyasî û xebata ayînî nêzîkî hev kirîbû. Rêkxistina Împeratorîya zordar bergirî kir di Elmanya de . Her wiha destora îstîqratî ya azadîyê bû bangeşeyek ji bo bawerîya bi aqil kirinê. Êrîşî ser Kilîsê kir ya ku navê wî di anîn Lahot Kenhotî wşk. Ji ber ku peymangeha (Tuîncn) ya ayînî xilas kirîbû. Heyîna vê xerîbîya sîyasî di encama sitema rejîma sîyasîye Di encama hewildana kilîsê de ji durxistina kesane. Ji ber wê jî Ayîn û Sîyaset (heman lîstîk encam dan. Ayîn ev fêrî xelkê kir ku armanca sitemkaran bû: Sivik temaşekirina mirovatîyê, nekarîna mirovan ji gehîştina armancê. Her wiha derxistina aramancê bi tekoşînekî taybet)²³ .

Ji ber wê jî Hegel bangeşeyek ji bo karê sîyasî dikir. Navê wê jî kirî bû Ayîn, wateya ayîna dawîya mirovatîyê radigehand. Li cem wî di gehe bi dil û soz ku serpêça ayînê babet bû: Ayîna Lahot Kenhutî wşk. Ev li jêr gehîştina (Ruhê Gel) di

²³Mucahîd Ebdulcebar Elam, *Eqil û şoreş*, Çapxaney Hars, Bexda, 1981, r,32 .

rêya dewleta Yunanî carek din diçe ji bo bingeha şoreşa Firansî. Ev jî buye sedemê xerîbîya hegêl xerîya xwe rihî û deronî. (Eger rih hêza razana rastîyan nema di vê cîhanê de wê demê rastî bi dest dixin. Di dawîya vê cîhanê de demekî dijwar namîne di navbera dewlet û hizrê cuda de)²⁴ . (Nehiştina xerîbîyê encamekê dide, di rêya zalbûna hişyarîyan ji bo beşkirina derketina yekêtiyê û kesayetiye bidestxistina azadiyê)²⁵ .

2.1.2. Rêbaza Marks Di Xerîbîya Civakî De

Karl Max (1818-1883 z) eşkere dika di nava rexneya civakê abrorîyê de dijwariyekî a dewlet û Burjuvazîyê de nîne. Wekî çawe nîşan daye, diwartî rikberîyekî navxweyî a civaka burjuvazîyê ye. Ji ber ku rewşa aborî û civakî taybete bi sud û kelûpelê bihadar, ji bo çêkirina mirovane.

Ji ber ku xweza rêbazekî sermayedarîyê bende li ser (Mirovatî û birsitî). Bi sedema dabeşkirina kare û kar jî di vê sayê de dabeş dibe ((Derketinek pesend û guncaw ji bo dewlemenda lê belê dibe sedemê kêmkirinê ji bo karkeran))²⁶ .

Li gel vê jî ((Karker milkê xwe nîne, milkê kesekî dine))²⁷ . Hêzek heye ku nunertîyê dika bi vî awayî ((Sermayedarî mirov çêdika lê dema ku mirov ji bo xwe sermayedarîyê çêbike))²⁸ . Karker û afrêner li gorî Marksîyan pêktê ji xebatkarê xerîb ku karker afrênerê şaristanîyê ye. Ew jî pêktê ji xerîbîya bingehîn û sermayedar. Sermayedar hêzekî civakîye ji ber wê jî xebatkar jî pêktê ji xerîbîya karê xwe.

Marks, pirsgirêka xerîbîyê bi vî awayî dîyarkir. Li ser bingehê nû, bi wêneyekî nû kî rexne bi giştî pêşkêş dika ji bo her du hizrên însrubolojî. Amaje bi vê dika naveroka dîroka aborîyê dîyar kirîye. Çavkanîyên darayî eşkere dika .

Yek ji lêkolînavan (Xweza sermayedara mirovatî û kesane. Ev şibandin jî ji bo nehiştina xerîbîyê di nava şaristanî û mirovatîyê de. Dema ku ew cîyawazîya

²⁴ Murad Wehbe, *Xorbet Roşenbîrî Gerdun*, Govarî Cîhanî Hizr, hj, 10, 1979, r, 100 .

²⁵ Mehmud Receb, *Xorbet*, Çapxaneyê Nur, Bexda, 1975, r, 175 .

²⁶ Karl Marks, *Destnîwîsekani Sali 1844, Aborî sîyasî û Felsefe*, weş, Hewars, 1977. r, 174 .

²⁷ Karil markis , r174.

²⁸ Murad wehbe , *el-îxtirab weluuhide, mecelet Alim elfikir*, hj, 10, 1979, r, 103.

civakî namîne, her wiha di rêje kêşanê de dibe sedemê ne hiştina xerîbîyê û xerîbîya mirov û xerîbîya şaristanî ²⁹.

2.1.3. Rêbaza Fîorbax Di Xerîbîya Ayînî De

Lodvîc Fôrbax (1804-1872) Yek ji xwendevanê Hegel, lê belê ew ji rêbaza mamostayê xwe derketîye. Rêbazek danî ku derdikeve ji hebûna xweda û ayînê. Retkirina ji bîrkirina azadîyê bi taybet Hegel ji dewletê girtîye. Her ji ber vê jî metirsîya zivirand amaje kirî bû retkirî bû li ser xerîbîyê (Sifetê milkdar) kurt kirina (alîyê bi cihkirina wê fêmkirinê li ser hişyarîya ayînî û ramanê felsefê .³⁰ Ji ber ku xerîbîya ayînî (Bingeheke ji bo giştî xerîbîyên felsefê, civakî, deronî û laşî)³¹ . Li gorî fikrê wî ayîn cewherê hemû rejîmekî sîyasîye ji ber wê jî mirov pêwîstî bi (Şerîeta dewletî û xebata mirovane ne bi şerîeta dewleta mesîhyetê)³². Fîorbax, pirtûkek a cewherê mesîhyet wekî alîyekî hîlbijard ji bo rexnegirtin di ayîna mesîhyetê de. Di alîyê ayînê de bi şeweyekî giştî, her wiha hest bi rexne girtinê di giştî wê felsefeya ku piştgirîya ayîna Lahot dikir. Bi şeweyekî çawanî û têr raman li cem wî xerîbî di vê çîrokê de destpê dike. " Lana" dibe " Alaxr " Ji ber vê jî amaje bi lahotîyê dike, wekî nexweşîyekî deronîye. Her wiha cîhanê jî gunehbar dike bibê reftarî, hejarî, rihî û zanistî. Li gorî vî ramanî Fîorbax bi vî awayî dawî lê tîne. Hêza ayînê di çêkirina kesayeta mirov deye ku xwe pê diparêze. Rastî pirsgirêkan tê.³³ Lê belê nehiştina xerîbîyê li cem wî ew dizivire ser karê hizir, kontirolkirina heyîna xwezayî û zivirîna wî a ji bo rastîyên destpêkê. Piştî jî azadîya xwe bi dest dixê

2.1.4. Rêbaza Xerîbîyê Di Îslamê De

Îslam hat ve gotina xerîbîyê eşkere kir, li ser asta rewşenbîrî, sîyasî û aborî de. Lê belê piştî belavbûna bangeşeya (Propaganda) îslamê , bi lez îslam çû jêr barê xerîbîyê. Heya wekî destpêkê lê hat, derbaz nebû misilman bi xerîn wesif kirin.(Fitne gomanbarî û ajaw belav bûn, bi têkçûna sîyasî û li ser nakukîya ayînî bû xerîbî. Bi

²⁹Mihemed Riza Cehfer, , *Xerîbî Le Şîrî Erebî Hawçerx*, Zankoy Kerkuk, weş, selam. 1990, r.14.

³⁰Yusra aureheman, *teteur elfikir elfelsefi*, weş barudî, 1970, r.45.

³¹Hisên Henefî Xerîbî Ayînî Layî Fîorbax , Govarî Hizir, hj, 60, 1979, r.44 .

³²Hisên Henefî, r.45 .

³³Hisên Henefî, 45

dizî çû nava deronîya xelkê de.Çi evxerîbîye erînî be yan jî nerênî be.)³⁴ Fermana (îslamyetê bi xerîbîyê re destpêkir û bi wê dizivire) Mînaka xerîbîyê ji me re eşkere dike.

Misilman di pêşerojê de li alîyekê di alîyê din de jî ((îslam hemû xelkê di nava xwe de girtîye, bi çend astekê misilman û bawermend hevdu digirin li ser pileya xerîbîyê:

Pileya yekem : Xerîbîya misilmanan di nava xelkê de. Pileya duwem : Xerîbîya bawermendan di nav misilmana de. Pileya Sêyem : Xerîbîya zanayan di nava bawerdaran de))³⁵. Xerîbîya zanayan bi hêztirîn corê xerîbîyê ye ku hejmarekî kêmin di nava xelkê de û kêmtir xelkê dibin.

Li gel serdema fetihîya îslamê şeweyê nu di xerîbîyê de derker. Bi eşkereyî derketîye holê ku xerîbîyê bi dizî ketîye di nava kesên misilman de.

-Rengan: Derhênerê çewsandina hozane di encama girêbesta civakê de. Ev jî ruberuyîya sîyasîye ku gehîştîye pileya sîyasî. Girtina dest a desthilatdar. Piştî niştecihî evan rolekî hebûn di derketina rengên xerîbîyên cuda cuda, hinek caran jî derketina wan bihevre.

Hinek lêkolînavan babeta xerîbîyê piştrast dikin. Sedemê bingeha xerîbîyê ayîne. Di enskilopedîya felsefeya erebî de hatîye, hebûna xerîbîyê dizivire ser sê ayînê asmanî (Yahudî, Mesîhî û îslam). Yahudî û mesîhî bi awayekî taybet lêkolîndikin (Xerîbîya mirov di cewher de ye dema ku Yezdanê dilovan ji biheştê dur xistîye, rêkirîye ser erdê.)³⁶

Di hizra îslamê de em dibînin ku balê têxe ser vê wateyê ku dizivire ji bo ayeta Quranê.Dema hat xwarê Adem eşkere dike rêdike ser erdê li gel hevsera xwe di beheştê de. İbn Erebi dibêje : ((Yekem xerîbîya rastî mirovan bê ewe ku hebûnekî

³⁴Fetah Xelîl, *Xorbet Le îslamda*, Govarî Hizir,hj,66,weş,Nur, 1979,r,84-85 .

³⁵Fetah Xelîl ,r87 .

³⁶Sadiq hîdaet, *El-îxtirab fî elfen dirase elfikir erebî elmuhasir*,weş hurîe, 1977,r46 .

hestî heye û dure ji niştîman. Xerîbîya niştîman di wî temenî deye ku di zigê dayîka xwe debûyîn. Rehma dayîka me niştîman bû dema em ji dayîk bûyîn xerîb bûn))³⁷. Fêmkirina xerîbîyê di ayînê de tenê derbaskirina pêşketinekê ye ji bo wateyekî asan. Dîyar kirîye di rêya hebûna zanîstê û felsefeya kevin ev fêmkirine li cem (Eflatonîyan) di rêbaza (Feyc) de ku dibêje : Cîhan û jîyan tenê şoravêke li cem kesên rast. Bingeha hebûn û çavkanîya hemû tiştê ye.) Ew mînakên pênaseya xerîbîyê dikin, bi şêweyekê eşkerene ku pêktên ji van pênaseyan. ((Alhorûî Alansarî) di pirtûka ((Mnzal Alsarîn)) de derbarê xerîbîyê de pêktê ji ((Fermanekê amaje bi tenêbûnê dike))³⁸

Hemû ewe tenêbûnê biwê wesfê ve pak dure ji hevrêgezîyê. Ew xerîbîye di nava wan de yan bi tenê bûn yan jî bi laşê bi kartine. Erkê tenêbûnê bi laşre pêktê ji xerîbîya niştîman. Ev xerîbîye hevbeşe di nava hemû xelkê de.³⁹ Hemû xelk di mala xwede xerîbin. Ji ber ku pêknayê ji mala dawî û ne ew maleye ku ji bo wê derketîye. Pêximber (S.a.s) Ji bo Ebdulayê kurê Emer di fermîne أو عيش في الدنيا كأنك غريب (عابر سبيل) ((Bijî di cîhanê de wekî xerîbek yan jî wekî rêbare))⁴⁰ (Lê belê xerîbîya kar pêktê ji xerîbîya kesên karsaz Ji xwedê tirsîn di nava xelkê sitemkar de û xirap kar. Xerîbîya rastgo di nava derdorê û xerîbîya zana jî di nava ne fêman de. Xerîbîya Erke Hreî Alansarî bi vî awayî pênase dike ((Xerîbî di destxistina rastîyane ku pêktê ji xerîbîya kesê pipor. Ji ber ku kesê pipor wekî nava xerîbîyê dibîne. Hilgirê zanîstekêye yan jî derhênerê firehe û yan jî radibe bi wêne kirinê, bicih kirinê yan jîdide pişt navekî xerîb bûye. Xerîbîya pispor ((Xerîbîya Xerîbe)) ji ber ku ew xerîbîye cîhanî paşeroje))⁴¹. Bi wî awayî ku behs kir xerîbî bi wateya îslama xerîbûye, di jîyana civakê de ne rasye û xerîbe.

Xerîbî bi rengdayîna jîyanê û firyoderan bûne rêyekî erênî û nerênî. Du desthilat daran hikim kirîye, desthilada fermanrawan û desthilatdara nefsi. Bi daxwaz

³⁷Men Bn Zadi, *Al sure Al-felsefe Alerbîye, Alclld Alawl*, Dar, elhurîe, Ç,1, 1966,r,79 .

³⁸Ebdule Bn Mihemd, *Menzl Alsalikîn, Alhrûî Alnsarî*, Ç,3, Çapxaney Çira,2009,r,126 .

³⁹Fetah Xelîl, *Xorbet Le îslamda*, Govarî Hizir, 1979,r 93.

⁴⁰îbin Qîm Elcozye, *Mdrac Alsalkîn*, Ç,3, Çapxaney Hars,2000,r,126 .

⁴¹Ebdule Bn Mihemd, *Mnazl Alsarîn, Elhrûî Alnsarî*, Ç,3, Çapxaney Çira,2009,r,128 .

û li ser daxwaza cudakirn xelkê bûye.Rejêmekê rihî di navxwede cih girt û di deronîyê de. Hestkirina bi parêzîyê ku cihê rejîyama sîyasî digirt tirs dixist dilê misilmanan de)) . Piştî xirabûna xwestekan têkbirin.⁴²

2.2. Xûrbetîya Giştî Rewşenbîran û Taybet A Hozanvanan

2.2.1. xerîbî hozanvana

Xorbetî, rewşenbîrên kurd û helbestvan û mirovên kurd dinalîne. Di navde û cihên ku rewşenbîr tê de dijîn derdikevin holê.

Dema derketina nediyar a xorbetî, rewşenbîr jî ji ber wê cîhanê ret dikan. Ev cîhana ku rewşenbîr çêdikin ne bê sude. Xorbetîya kevin, aborî, dîrok û serdemî hemû bi ser hevde kombûnecivak jî wan dagîr dike. Behskirina rewşenbîrên kurd bi giştî bi goherînî ji bo behskirina hozanvanîyê. Li gel giranîya jîyanê û hilweşandina civakê belavbûna xerîbîyê serhîldide. Di alîyek din dejî zutir ji kesên din rastî derdan dibin. Ji ber ku " ⁴³Hestekî hêzekî demikî heye, ⁴⁴ji ber ku hozanvan jîyanê dibîne ruberûyê hêvîyan tên. Hestê hozanvan ji bo jîyan û azadîyê gelek girane. Giranîya civakê jî dibe sedemê durketina ji derdor" (Goherîna di hestan de hestên xerîbîyê fireh û teng dike. Di xwe de van hemûyan komdike û ezmûna helbstan jî di xwe de komdike.⁴⁵

Li gel vê jî hozanvan bi xwzaya xwe di jîyana xerîbîyê de dijî. Neçar dibe her wekî, Yunc dibêje : " Mirov tê gohertin di kare bê hest be di jîyana mirovatî de derbikev.⁴⁶ Di nevçûna van hestan de girêdayîye. Bi taybetî sedemên sîyasî û aborî du sedemên serekî yên xerîbîyêne di serdema nû de. ⁴⁷.

Sinorê xorbetê tenê bi rihê niştîmanî ve ne girêdayîye. Belkû ev sinor derbazkirîye ji bo xorbetîya zimanê dayîkê. Dema ku hozanvan dibîne bi zimanê bîyanî di axive wekî Nalî dibêje :

⁴²Ebdulla Alsadq Mehmud *Xorbet Alzîl*, Mcle Alfsul, Mcle,4,1984,r,132.

⁴³ Feîsel Derac ,*elmuseqef elerebî*, weş el-hedase 2000,t2,r120 .

⁴⁴ Elî ebas eluan, *tetewr elşîhir elerebî elhedîs fî elîraq*, weş,nur 1983,r91.

⁴⁵Ebdelkerîm Razî ceher,*remad elşîhir fî elbunîe elmeuzuhîe u elfenîe*,weş elseqafe,bexda 1995,r80.

⁴⁶Îzedîn îsmahîl ,*raveî derunî wêje* ,weş wişyr,hewlêr,2001,r35 .

⁴⁷Îzedîn îsmahîl, *Rave deronî wêje*, r,91

Em şerhî derdî xorbete, lem sozî hîcrete.
 Dil renga bêbe aw be çawa bikat obûr.
 Aya meqamî rûxsete lem beyne bêmewe.
 Ya meslehet teweqûfe ta yemî nefî sor.
 (Nalî) le şewqî tûye : Denêrê Selamî dur.....⁴⁸

Hozanvanan jîyana tehil ya xorbetîyê tamkirîne, dure ji nîştîmanê û xorbetîya giran dîtîne. Her wiha zimanê helbestan heman zimanê rojane yê asanî ê mirovan nîne. Li gorî corê peyvane û corê ferhengî û watasazîye. Belku zimanê helbestê core zimanekî bilinde bi wateyan ve girêdayîye. Ji ber ku ziman di çarçûveya cîhana xwe de amraza wesfîye. Di berhemên wêjeyê de çavkanîyekî rojane û lîvînekî hûr ya hestîye. Di rewşa yekem de erka delalîyê heye. Di rewşa duwem de jî erkê nîhayî heye, mînakek ji wan helbestane ku rastî xerîbîyê hatîye. Di nava helbestên Rostem Bacelanî de tê gotin. Ev helbest tê wateya armanca xerîbîyê û core zimanê nîhayî bikartîne. Herî zêde pêktê ji hevsengîya di nava peyvande" Ev jî herî zêde ji bo bexşînê bi bandore. Her weku dibêje :

Tarmayî wek sêberî balam biçûk debêtewe.
 Gewretirîş debêtewe.
 Txubê grdu lendu kolan û cogele û şeqamekanîş debezênê.
 Em kirdare peywendî be minî xerîbewe heye.
 Eger min nebim, em kirdareş bûnî nabê.⁴⁹

Xorbetîya helbestvanan ji ber koçkirina xwesteka xweye. Hozanvan Bêtoş ev jî bûye sedemê çêbûna wêneyê dil tengîyê. Bêtoş jî di xorbetîya xwe de dibêje :

Ala hî bîtoş waknafha altî	Ykad yruî alsadyat srabha.
Mrabe îzrî balebîr rxahmî	Wthza balvbî alnfor keabha
Blad bha hl şbab tmamî.	Wawl arç ms eldî trabha.
Lqd kan lî mnha erîn wkan mn.	Mqamî lha shb skob rbabha.

⁴⁸Mela Ebdulkerîm Muterîs *Dîwanî Nalî, Lêkolînewey*, r, 206

⁴⁹Mihemd Salih Ebdulrehman, *Namoyî Le Şîhrekani Rostam Bacelan*, zankoî sileîmanî 2013, r, 47

Wlkn deanî laxtrabha meşr	Xyap ajalawahwal mac ebabha.
Fha crtha hcr alhsam qrabh.	Elî rxmha tbkî elî hçabha.
îez elî alansan tudîh nurh	wsud cead an tnaî şbabha.
Werb qçaya la aba hsn lha	bha bed abeadî fcl msabha.
Feûçt enha fî axtrabî rfea.	Mn aldhr yeî alnîrîn glabha.
Wmn îglb alelya îcb kl fdfd.	Wan sawrth asdha û jabha. ⁵⁰

Bi vî awayî cihgirîya helbestvana di jîyana xorbetîyê de cihê xwe girtîye. Gelek ji wan êşa xorbetîyê kêşandîne " Qorbanîyan rêrewa xorbetîyê jî heye derketina qorbanîyan jî pêktê ji ruberûyê⁵¹.

⁵⁰D.Elî mehmoode ali elpişderî ,*Terîqet elbesahîr îla hedîqet elseraîr ,elelame elbêtuşî* ,dirase we tehqîq wş nur 2011,r 35 .

⁵¹ Mehemed razî cehfer,*elxurbe we elîxtirab fî elşhîr elerebî elmuhasir*,weş,sebah1988,r44.

3.CORÊN XORBETÎYÊ

3.1. Xerîbî Beramber Mirovan

Xorbetî rewşekî herî girane, beramberî mirovan tê. Sedemên xorbetîyê jî evin; alozbûna jîyanê, berfirehbûna aqilê mirovan, Pêşketina zanîstê, teknoloji û daxwazîya pêwîstiyên mirovan. Belkû li gel kesan giranbe dema ne zane çawe li gel rêve biçe. Xorbet bi hemû corên xwe durketine ji nîştîman, xalfetekî deronî û pêdîvîye li ser kesan. " Her wiha mirov xwe bi bihayan ve xerîkkirin û durketin, pişt goh xistina biha manewî. Xwe di çand, reftar û peywendîyên civakî de dibîne.⁵²

Di fermanekî pîroz de Ebû Horeyre şîrove dike. Pêximber Mihemed (S.a.s) di fermîne :

(ستكون فتن , القاعد فيها خير من القائم , والقائم فيها خير من الماشي , والماشي فيها خير من الساعي , ومن يشرف لها تستشرفه , ومن وجد ملجأ أو معاذا فليعذبه)⁵³

Bê goman rojek wê were mirovê di cîhana xwe de hest bi xorbetîyê bike. Ev acizî û zehmetîye beramberî reftarekî bilind dibe. Di demekê de raftar rastî nizimbûn û roxanê tê. Kesên di nava civakê de jî rastî xerîbîyê tên. " Lê belê kesên ciwan ê baliq ji hemu kesên din zêdetir rastî xerîbîyê tên. Ji ber ku gelek hestiyarin, ji bo vê jî ev rewşe û goherîne arîkarîye ji bo ji hemû kesekê zêdetir rastî xorbetî û xerîbîyê bibin. "⁵⁴Em dikarin bêjin xerîbûn pirsgirêkekî mezin a ciwana ye, di hemû deman de singê ciwana digire.

Wekî me dayî eşkerekirin jî beşê xerîbîyê beşekî berfirehe. Her yek ji wan li gorî pisporîya wan ev xorbetîye bi ser wan de hatîye. Her yekê li gorî xwe pênase kirîye, ev jî bûye sedemê corên xerîbîyê berfireh bibe. Ji ber ku mirov hertim beramberî tiştên nû xerîb dibe.

⁵²Serkewt Sedî Qadir ,*Namoyî Le Romanekani Salih Umerda* , weş,selam, 2011,r79

⁵³Rwa Albxaî, 3601,w muslim, 2886

⁵⁴Kerîm Şerîf Qereçetanî, *Hendêk Nexoşî û Giriftî Deronî û Komelayetî*, weş,aras,2013 r, 45 .

3.2.Cureyên Xerîbîyê

Li vir emê behsa van corên xerîbîyê bikin ku me di şeş xalan de daye dîyarkirin.

3.2.1.Xerîbîya Civakî

Xerîbîya civakî wekî corekî xerîbîya ne goncaw a li gel derdore. " Xerîbîya civakî,, wate nebûna armanca civakê li cem kesê xerîb. Bi şeweyekê nikare reftar û hizir xwe pêşkêş bike. Kesê xerîb wisan hîs dike, eger bi xwaze armanca xwe derbixîne na be kar pêwer û reftarê civakê bike." ⁵⁵

Bê goman çêbûna vê rewşê li cem kesan ne ji xweyîye. Belkû di encama pêşîde civak li gel kesan ne goncawa, li ser mafan jî cîyawazî kirîye dinava çînan de. Mînak : Di nava Pizîşkek û tehmîrkerekê de, yan jî di nava dadwerek û fermanberekê de. Ha di vir de kes bawerî bi pêkerên civakê namîne, di xwaze dur bikeve ji zagonên civakê û armancên wê. ⁵⁶

Di alîyek din de xorbetîya civakê çêdibe, dilsozîya mirovan bi civakê û çanda wêre. Dema temaşeyî derdor dikin ne dilsozê wê çanda di encama xorbetîyê de çêbûne. Di alîyek din de jî ev xorbetî dinava dewlemend û feqîr de çêdibe. Nebûna hevaltî yan jî cîrantî dibe sedemê wê çêbibe. Corek din yê xorbetîyê, dinava deshilat û hemwelatîyan de. Bi corekê çîna serî hemû sermayê welat ji xwe re kombike û çîna jêr jî tenê temaşe bike. Bê kar jî bimîne di encama ne zagonî de bê hîvîbe û xerîb bibe. Di vê rewşê de kes nikare vê sîstemê bi goherîne. " Hest bi bê desthilatîyê jî dike. Bikare kar li ser wan bîr ûbawerî û helwestên civakî bike ku kar li gel wan jî têkîrin⁵⁷. Di vî demî de ew goherînên rastî alîyên civakî hatîn, peywendîya elektironîk û şoreşa tureyîya civakê ye. Bi şeweyekî berçav bal kêşandîyê ser alîyê civakê. Hejarî û nebûnî sedemek dine ji bo xerîbîya civakî. Ji ber ku hejarî wisan dike bawerîya wan

⁵⁵Mehemed zînun ,*elhîsar elîqtîsadî u elîxtirab elîctîmahî uesruha fî siluk eltelebe* weş ,nesir,1995,r15.

⁵⁶ - Serkewt Sedî Qadir, *Namoyî Le Romanekanî Salih Umar*, weş ,selam, 20011 ,r, 34

⁵⁷ - Aram Mihemed Qadir, *Namoyî LeŞiirî Kurdî da Kurmancî Xwaro*, 1975-2000, r, 24

têk biçê û di nava civakê de jî hest bi xerîbîyê bike. Îmamê Elî rehma yezdan li ser be, li gorî wî binçîneya civakê ji bo xerîbîyê hejartîye dem di fermîne:

(الغنى في الغربة وطن والفقير في الوطن غربة)⁵⁸

Di vê fermana Îmamê Elî (r.) wateya wê eger di welatê xwe de jî be, hejarî hest bi xerîbîyê dike. Eger durî welat be û dewlemend be hestbi xerîbîyê nake. Xerîbîya civakî hêza kes ya li nav civakêye ". Di vê rewşê de canê afrêner tê kuştin . Şerê kesan li ser navê goherîn û pêşketinê de kêmbibe. Hewildanekî bilind ji bo kes nabe.

3.2.2. Xerîbîya Fikrî

Girantirîn corê xerîbîyê ye, bi tayber di nava nîştîman de. Di destpêkê de çêbûna vê xorbetîyê hizra pêşe rojê ye. Li gorî Haydîger filozofê bongerîyan, jîyan du şêwaz heye. Yekem: Şêwazê resen. Duwem jî: Şêwazê ne resen. Di şêwaza resende ji bo xwe biryar dide, şêwe û pêşkêşkirina xwe werdigire. Lê belê şêwaza ne resen, ew heyîneye ku di nav nihade çêbûye û biryarnama pêşbînîyên ne civakî biryarê li ser dide. Xerîbî pêwîstî bi hebûna ne resentiye heye ku mirov têde dur perst dibe. Ji hebûna reseniya xwe cuda dibe. Lê belê li gorî Sarter xerîbî rewşekî xwezayîye, ji bo mirovan helwestekî pir girînege di cîhana bê armanc de⁵⁹.

Ev corê xerîbî wê valetîya di navbera hizirîna kes û rewşa civakê de heyî dide dîyarkirin. Di encamê de kes aciz û bê hêvî dibe ji hêza hemû corên biryardanê dur dikeve.

Li gorî gelek nivîskaran berjewendîya kesan dibe sedemê xerîkbûna kes a bi jîyana rojane re. Di heman demê de dur dikeve ji meselên girîng û cewherî.⁶⁰

Ev corê xerîbîyê herî zêde peywendî bi jîyana mirovan ve heye. Di jîyanê de ev li cem mirovan êşkereye ku pêwîste jîyanê di cihde bihêle ". Ji bo mirovan

⁵⁸ -îmam alî (*nehc elbelaxe*) muasese neşîr îslamî ç 4 ,1415 ,r155 .

⁵⁹ - Yusuf Osman Hemed, *Antî Kesayetî, Xesletî Namobûn*, weş, elenwar, 1980, r, 203

⁶⁰ - Sabir Bekir Bokanî, *Şorbûneweyek Bero nax û Pantanî Namoyî*, weş, teraîq, 1999, r, 235

eşkereye ku jîyana ser xwezayê demikîye. Xwezajî ew cihê ku hatîye dîyarkirin heya demekê tê de dimîne û piştî jê koç dike. Em dikarin jê navê xerîbîya fikrî behsa xerîbbûnê bikin.⁶¹

3.2.3.Xerîbîya Şexsî, Xweyî, (Ezî)

Xerîbîya şexsî yek ji corên herî girîng ê xerîbîyê tê zanîn. Îro gelek kesên di cîhanê de girtîne. Xerîbîya şexsî di sedsala 19 an de pelê xwe avêtîye di nava hemu alîyan de. Li gorî cîyawazîya wateyên wê jî gohertin bi ser de hatîye. Hinek dîrok nas dîroka xerîbîya şexsî di zivirîne ser hizrê Yunana Kevin, di wê rewşa kêşanê de ye ku mirov bi xwe dide destê wêneyan.⁶²

Gelek caran mirov nikare daxwaza maf û xwestekên xwe bike. Civak dibe rêgirê wan xwestekan⁶³. Êdî civak bi serbazî wekî dezgayekî serqut heskirin û xwestekan di çirmisîne. Êdî nikare di vê serbazgehê de fikrên xwe pêşbixe. Ji ber wê jî hest bi ne aramîyê dike, di rewşekê de ku deron ne xweş dibe.

Her wekî From Goten divê rewşê de mirov peywendîya li gel rastîya xwe de ji dest dide. Eger di çend rewşên dîyar de nebe, mirov asayîya xwe ji dest dide. Her roj xwe razî dike, helwestên wî demekê ji bo demekî din yan jî rojek ta roja din goherîn bi ser de tê.

((Gelek nivîskar hebûn xerîbî di navxwe de bi şêweyekî cor bi cor eşkere dikirin. Di nava wan de Hîrbt Markoz, Rayt Mîler, Êrîk From. Ji ber wê heya mirov were li jêr çendîn şêweyê (Bt) kirinê yan jî (Şt) kirinê re ji xwe dur dikeve . Wekî nêçîrekê didedevî wî wê))⁶⁴.

((Hemû kesekê kesayetî û nasnameyekî taybet a xwe heye. Ji nasname û kesayetîyên xelkên din cuda dike. Gelek zehmete di hemu cîhanê de du kes hebin (

⁶¹ - cemîl mehdî mehemed, *alixtrab el seqafi fi elcamihat el iraqi* , rsalet diktora kulîet elterbîe îbin ruşid, camîhet bexdad 1995, r53 .

⁶² - Aram Mihemed Qadir, *Namoyî LeŞiirî Kurdî da Kurmancî Xwaro*, 1975-2000, r, 26 .

⁶³ - Yusuf Osman Hemed, *Antî Kesayetî, Xesletî Namobûn*, weş elenwar 1080, r, 202 .

⁶⁴ -Azad resul arif, *Çekî Namoyî Le Nêwan Felsefey Hevçerx û Firoîdîzm Nêwêda*, weş, aras, Eylul, 2009, r,5 .

%100) hemû tiştên wan wekî hevbe. Her ew taybetîyên cudane tamê dide jîyanê û kesan. Xwe bi hemû kesekê nade. Mirov beramberî şexsîyeta xwe rastî xerîbîyêtê. Ji xwe û nasnameya kesayetîya xwe dikeve gomanê. Du dil be, bi çavekî sivik temaşekirin, bawerî bi xwe nemîne, hest bi kêmiyê bike, bawerî bi hêz û hizrê wî nemîne, serbestîya xwe ji dest bide û li gorî xwestekan wan bi rêve biçê. Ev pirsgirêkane zêdetir dibe dema hest bi hêza pêşî bê kirin, alîyê pêşketinê jî ne çêbûye û bi çavekî sivik tê temaşekirin.))⁶⁵ Eger kes di jîyanekî asayî de ne jîya û piştî karê wî wekî pêwîst li ber çavan ne hat girtin, neçar dibe biçê cem wê xefkirina bê xwestek. Bi vî awayî kes nikare berbi heyîna xwe biçê, wê her xerîbibe.

3.2.4. Xerîbîya Ayînî (Olî)

Xerîbîya ayînî jî corekî ji xerîbîyê ye, her wekî me gotî ; Fîorbax, wekî binçîneya hemû xerîbîyê dide diyarkirin. Fikrên zanayan li ser vî corê xerîbîyê cîyawazin û hinek dijî yekin. ((Armanca vê alîyê xerîbîyê ew ku cudabûna Adem ji ((Xudê)) Her wekî Keşe Pols di nameyekê de ji bo xelkê Efsos dide destnîşankirin, di demekê de axaftinê li ser xirapan dike û dibêje : ((Ez ji we re dibêjim û sond dixwim bi Yezdan, êdî li pey pot perestan neçin, rêbazên piç peyda nekin. Ew ji ber dil hişkîyê ji jîyanê xerîb bûne. Bi taybet dema ku hemû hestên xwe ji dest didin. Milê xwe didin xirabîyê qet jê naçin paş))⁶⁶.

Bawermendan jî heman fikir hene, durketina ji xwedê sedemekî xerîbîyê ye. Lê belê Keşe Pols li cihek din axaftinek wekî axaftina ji berê kirî dibêje : ((Bi rastî ez nizanim çî bikim. Ewa ku ez dixwazim nakim, ya ku ez naxwazim dikim)). Ya ku dixwaze wekî mirovekê bike nikare. Lê belê ya ku naxwaze pêwîste li jêr ayînê de bike. Ayîn kesayetekî baş ji te dixwaze û dagîr dike. Ev bi xwe jî xerîb bûne. Her li ser vê rewşa duwem, li gorî hinek nivîskaran mirov bi ayînê û dibin bandora ayînê de ji jîyana xwe xerîb dibe.

⁶⁵ - Kerîm Şerîf Qereçetanî, *Hendêk Nexoşî û Giriftî Deronî û Komelayetî*, weş, aras, 2013, r, 54-55 .

⁶⁶ - Sabir Bekir Bokanî, *Şorbûneweyek Bero nax û Pantanî Namoyî*, r, weş zanko, silîmanî, 2011, 235 .

Li gorî fikrê wan lêkolînavan, mirov hemû hêza xwe dide hêzekî ne dîyar. Ji bo ku xwe ji hemû bûyeran bi parêze, hertim çavê wî li asîmane ji bo baş kirina jîyana taybet a xwe. Dikare di rêya pêkhêneran de jîyana xwe baştir bike. Gerçî mirov di vê rewşê de ji ber ayînê xerîb bûye destê wî di westê milê wî dişkê ji ber vê hêza ne dîyar. Xwe rasdestî desthlatîya ayînê kirîye. Lê belê fêrnêkirina ji ayînê wisan dike mirov bi tirse û dest ji jîyanê rake. Ji ber ku ayîn bixwe rêbazeke ji bo mirov di jîyanê de rênas be.

3.2.5. Xerîbîya Coxrafî

Armanca vî corê xerîbîyê, cih hiştin û koçkirine ji navçeyekî coxrafî a dîyare ku ji nîştîmana wîye diçe navçeyekî din ku xerîb bûye. Ji ber vê jî em dikarin wekî (Xerîbîya Nîştîman) jî bidîn destnîşankirin.

((Xerîbîya coxrafî goherîna coxrafîyayê ye ji welatek ji bo welatek din. Yan jî ji şewazek ji bo şewazek din a jîyanê. Yan jî ji herêmek diçe herêmekî din... Ev jî ji bo bidest xistina parçeyekî nanê rojaneye))⁶⁷. Bê goman evcorê xerîbîyê li ser daxwaza kese, ne bi zorê ye. Ji ber ku daxwaza kes li ser wê bû cihê xwe bihêle û here. Eger em temaşeyî van pênaseyên coxrafî bikîn ku dibêjin : ((Mal barkirina kesekê ji xwezaya xwe ji bo xwezayek din , dur yan jî nêzîk))⁶⁸. Xerîbîyekî bi zorê ye qet xwesteka kes li ser nîne. Belku ji ber sedemêkî sîyasî yan jî civakî be. Em dikarin bêjin xerîbîya coxrafî li ser daxwaza kese ev jî li ser xwendinê be yan jî kar be. Yan jî xerîbîyek bi zorê be, her wekî me behskirî.

((Xerîbî êşekî girane rastî wan kesena tê ku dur ketine ji nîştîman yan jî xelkên xwe. Sedemê vî corê xerîbîyê pêwîstî bi koçberî û malavayîya heyîye. Ka ev ji ber zilm û zorîya desthilat, tirs be yan jî her sedemek din be))). Piştî koçkirinê kes rastî dijîyekî temam dibe. Di nava her yek (ziman, çand, rewşenbîrî peywendîyên civakî û her corekî hizirînê... hwkd) Ew welatî koçkirîye. Ev rewşekî girane ji bo kes. Li gel vê rewşa zehmet belku kes rastî xerîbîyê were.

⁶⁷ - Aram Mihemed Qadir, *Namoyî LeŞiirî Kurdî da Kurmancî Xwaro*, 1975-2000, r, 20 .-21 .

⁶⁸ - Meryem necme , *elîxtirab en al weten we tesîruha al ruhîe wel fikrîe*, bixdad 2009 , r 48 .

3.2.6.Xerîbîya Aborî

Xerîbîya aborî jî wekî corek ji corên xerîbîyê ye. Cara destpêkê ji aliyê (Karl Max), bi şêweyekî zanîstî di destnivîsên avorî û felsefîkde, di sala 1844 an de destnîşan kirîye. ((Li gorî Marks xerîbîya aborî pêktê ji , berhemên ku li jêr deshilat û milkîyeta xwedî derbikeve bibe malê kesekî din. Ew kes jî wê berhemê bike dar destê xwedîyê resen yê berhemê))⁶⁹. Di civaka desthilatdar de karker berhemên bi desttêxe. Marks tenê di aliyê aborîyê de diçe xerîbîyê. Li gorî wî xerîbî li gek desthilata malî a tayber, dabeşbûna civakê bi ser çend çînan re derdikeve holê.Ev jî dema tê çareserkirin, bi goherîna sîstema aborîyê sermayedar jî ji bo sosyalîzmê ye. Ji ber ku di sîstema sosyalîzmê de karker bi xwe xwedîyê berhemane " Lenîn li gorî wî çîna karkerb (Piroleterya) çîneke di kare xerîbîyê ne hêle, ev jî bi wêye dema ku di karê xwe de azad be û serbest bê berdand.

Me dikarî di xerîbîya civakî de jî behsa xerîbîya aborî jî bikîn. Ji ber ku aliyê aborî jî faktorekî serekîye di xolqandina xerîbîya civakî de. Lêbelê xerîbîya aborî jî cîhanekî berfirehe. Ji ber wê jî me baş zanî ku em wekî corekî serbixwe bidîn dîyarkirin.

((Xerîbîya aborî herî zêde aliyê felsefeya madî girîngîyê pê dide û çareserîyê jî jêre çêdike. Bi wateya kesekê tê ku di karê xwe de berhem bi dest bixe. (Wate hêza zevtkirinê be) Ev jî peywendîyekî raste rast bi civaka çîneyatîyê ve heye.⁷⁰ Di vê civakê de mirov bazarê li gel kel û pelan dike. Mirov dibe amêrekî xav cuda nabe ji wan berhemên ku çêdike.Kesayetî jî bihayê xwe ji dest dide. Hinek caran jî vî corê xerîbîyê re jî dibêjin xerîbîya kar yan jî ya çîneyatî))). Mirov qasî wê amarêka çêdike nabe.

⁶⁹- D.şakir nurî ,*elîxtirab fi elfîkir markisî* ,macelet elfîkir elhilmî elteqedumî, metbehe dar elhurîe ,bexdad,1984,r28 .

⁷⁰ Sirwe resul, *aştî heme sebarete be çemgî xerîbî* ,hewlêr 1999,r25 .

((Berhem anîn berdestîya babeta berhem anînê ye. Ji ber vê jî afrêner xerîb dibe ji berhem eger jê dur bikeve û hêza zevt kirinê jî li ser nebe.))⁷¹Xerîbî rastî hemû kesekê tê, her kesek jî li gorî hêza xwe rastî wê dibe.

3.3.Xerîbîya Wêjeya Cîhanê

Bê goman wêje bi xwe cîhanekî berfirehe, nivîskaran jî hewildaye di tekstan de rengê rêjeya rastîyê derbixe. Hemu rewşên erênî yên wekî heskirin , rêzgirtin yeksanîya bilind bi ser hemû alîyan de kêşaye. Yan jî xelkê hişyar dike ji bo bi destxistina maf û xwestekên wan. Wêje perdeyê li ser rewşên ne baş yên civakê radike û xalên nerênî jî destnîşan dike. Xerîbî wekî rewşekî ne asayî di nava civakê û berhemên wêjeyî yên cuda cuda hestpê têkirin.

Di vir de emê hewilbidin ji bo eşkerekirina nivîsîna me, çend berhemên wêjeyî yên cîhanê ê di nava neteweyên cîyawazde bi girîn dest.

Di berhemên wêjeyî de xerîbî tê xuyakirin. Emê bizivir Sedsala 5 anjî berî zayînê, Şanonameya (Odîb Paşa) ku nivîskarê wê (Soflost) e. Em temaşedikîn nivîskar mînakekî xerîbû. Her çawe ku zarok çenedibû meqamê wî wekî kuretîyê bû. Lê belê goh nade wê ku piştve tê xistin û hewaleyê xwezayê tê kirin.

Ji bo cihekê rizgar bike bêyî agahîya wê çarenûsê li bendê dimîne. Wekî xerîbekî li bajarê Kornet dij. Nivîskar, xerîbî di encama derbederîya deronîyê de pir dibe. Sofîklos di vê şanonameyê de wêneyê kesayetîyekê di kêşe, di hemû alîyên xerîbîyê de ew nikare bi tena xwe û serbestî bijî.Ji ber wê jî dixwaze peywendîya wî bi derdore nemîne.⁷²

Gelek ji berhemên wêjeyî yên cîhanê wekî çîrokên milî û xurafî bi sêhrê , bandora wan heye li ser kesên nû yên corbi cor ê serdemên cîyawaz. Çîroka (Hezr û Yek şev) heya niha bi ser hemû wan karandeye. Bandora wê li ser hemû afrênerên wêjeyê heye. Bandorîya Hezar û Yek şev tîne li ser wêjeya Erebi nîne, belku bandora

⁷¹ -Ahmed nesîm berqawî ,*elfelsefe elame* ,camîhet dimişiq ,1981 ,r324 .

⁷² D. mehemed ebas yusif,*elîxtirab welîbdah elfenî*,weş nesir bexdad,1987,r25

wê li ser wêjeya cîhanê hemûyê heye. Giringîya wê di keyfxweşîya bi (sembol) deye. Ew ziman û efsane, çîrokên ku behsan cin dike pêve hatîye girêdan. Her vê jî wisan kirîye ku ev berheme hertim balkêş be. Di heman demê de jî bandorîya wê jî berdewam be. Ya ku di çêroka Hezar û Yek şev de taybete bi xerîbîyê ve ew jî çîroka (Rawçî û Dêw) e. Daku em di vê çîrokê de xerîbîya kesên sembol dîyar bikin.

Kurtîya çîrokê bi vî awayîye : (Masîvanek li xêzana xwe dijî derbara wî ya jîyanê jî li ser wê masîvanîyê ye. Xwezayîya wî wisan bû ku di rojekê de tura xwe çar çaran avêt. Rojekê sê çaran tura xwe li pey hev avêt. Bêyî ku tiştê bi dest bikeve tenê ji bilî hinek tiştan ku ji bo masîvanekî hêsan bû. (Kerekî mirî, Gozikekî tejî lîm û pîsatî...) Di cara çarê de pişt bi yezdan ve girê da Gozikekî sifir dît ku mora Hezretî Silêmanli ser bû. Masîvan gelek keyfxweş bû, xwest bibe bazara sifir firoşan bi firoşe. Lê belê gozik gelek giran bû. Masîvan kêrekî li serê gozikê dide di wî demî de duyekî berbi asîman ve bilind bû û Piştire bû dêwek. Wî dêwî biryar dabû kesêku wî ji wê gozikê xilas bike wî xelat bike. Lê belê kesekî rizgar nekir. Wisan rêket ew masîvan rastî vê helwestê were ku li ser hemu bihayê reftarî be. Masîvan wisan dizanî wê dêw wî bi kuje, biryarda bi pîlanekê wî disan bavê je û bizivire nav gozikê. Di pîlana xwe de serkeftî bû. Piştire dêw soz da wî ku vê carê wî derbixe samanekî mezin bide wî. Dêw soza xwe bi cih anî. Piştî ji gozikê derket, daxwaz ji avê kir bereketa xwe pêşkêşî vî masîvanî bike. Masîvan tura xwe avêt çar masî pêve hatin ku rengên wan cuda bûn. Dêw wî agahdar dike ku vab masîyan bike dîyarî bide paşa û ew jî wî xelat bike. Dema ku masîvan masî pêşkêşî wî kir, Paşa temaşekir masî ne masîyên asayîne. Ji ber wê jî daxwaz ji masîvan kir ku wî cihê ev masî jê anî nîşa wî bide. ⁷³

((Ew cihe bajarê pîrevokan bû paşayekî ciwan hikmê wan dikir. Jina wî paşayî keça mamiş bû. Di heman demê de xîyanet li gel bendîyekî reş lê dikir. Ji ber wê jî paşa sezayê wî ew bûku jina wî bizivire wekî heywanekî beşê serî mirov be û beşê xarê jî kevir be. Piştire pîrevokê sihêr li xelkê bajêr kir ew kir çar masî. Masîyên spî misilmanin, masîyên şîn mesîhîne, masîyên zerjî kafirin û masîyên sor jî Mucusîne. Bi alîkarîya paşayê yekem ew pîrevoke li ser bajêr hat rakirin. Gelê wî

⁷³ - W cewher mehmed daraxa, *hezarû yek şev*, c1, weş şivan, silîmanî, 2007, r38-42.

dîsan zivirîn wekî destpêkê, lê tenê jina reş nebe, sezayê mirinê lê hat birîn. Piştîre paşa her du paşayên keçên masîvan xwast))⁷⁴ Di vê çîrokê de du kesayetên girîng hene. Her du jî di nava komek qeyrana de dijîn. Her yek ji wan jî xwedî armancekî gelekî . Dixwazin bi dest xwe bixin. Masîvan jî jinek û sê zarok hene ku hejarin. Dêw jî wînda bû û wekî mirinê êrişî jîyanê dikir ji ber ku dinava gozikê de girtî bû, heya demekî dirêj hi ber Silêman Pêxîber (xudy jê razî be) buye hêvîya wî ku îmanê bi dest bixw.

Em dikarin di vir de li ser hinek xalan bi sekinîn ku taybetin bi çîrokê ve:

- 1- Masîvan mirove, dêw jî cine.
- 2- Masîvan ji goşt û xwîn çêbûye, dêw jî ji dukelê çêbûye.
- 3- Serdema masîvan cudaye ji serdema dêw 1800 sai.
- 4- Dêw di nava gozikê de hatîye girtin, dure ji cîhana ji derve qet agahîya wî ji tiştên ji derve nîne. Lê belê masîvan ji derveyî gozikê ye peywendîya wî bi cîhana ji derve re heye. Agahîya wî ji wan tiştên çêdibe dibe.

Ew xalên ku me behskir, misogerîyê li ser hebûn û cîywazîya di navbera wan her du kesayetên de dike. Li ser asata fîzîkî û bîyolojî. Her wiha li ser asata cih û dem de. Di vir de em di gehin wê encamê ku ev herdu kesayet ji bo du cîhanê cîyawaz dijîn û di heman demê de jî. Em dikarin bêjin her yek ji van her du kesayetên xerîbî bi cîhana kesayetên din re dike. Li ser vê bîngê jî eger em temaşeyî reftarê dêw bikî, Peywendîyekî xerîb heye di nava cîhana dêw û masîvan de))). Her yek ji van jîyanekî taybet ya xwe heye, masîvan cudaye ji yê din. Ji bilî vê dêw ji alîyê Hazretî Silêman ve pêşîya 1800 salan xistibû di nava vê gozikê de. Ji ber vê jî dema ji vê gozikê rizgar bû hat ji derve serdem bi temamî hatibû gohertin. Êdî ev hemû sedem bûn ji bo xerîbîya din.

Dantî yek ji helbestvanên sedsala naveraste, mînakekî dine ji bo xerîbîye. Karê wî jî bi navê (Jîyanekî Nû) lêkolînekî tejiye ji bo rewşa xerîbîya xwe. Her wiha (

⁷⁴ D. ebuqadir şîrîf musa ,*qra cedîde fi hikaye elif leile we leile* ,lîxtirab we remzîethu fi hikaie ,elseyad wel îfrît , 17-3-2010 .

Komedyaya Yezdanî) berhemk din ya xerîbîyê ye.⁷⁵ Komedyaya Yezdan ji sê beşan pêkhatîye: (Dozex, Pakjge, Biheşt) Dantî di vê berhemê de rexne li zilamên ayînê û kilîsê papa digire. Behsa çavdêriya zilamê Kilîsê dike. Dantî, di vê berhemê de agirê dojhê çêkirîye ji bo Papa û ewên ku di jîyanê de gunehbarin. Bi kurtî Dantî li dijî dezgahên dewletê bû, dewletî ji alîyê zilamên ayînê ve di hat rêvebirin. Ji ber wê jî li dijî kilîseyê bû xwe wekî xerîb zanîye li beramberî desthilatan. ((Şekspîr 1564- 1616)) Ew helbestvan û şano nivîse bûye Şahkarê samanê mirovatîyê heya dawî.⁷⁶ ((Şekspîr di (Hamlet) de kesekî xerîbe. Pelewanê wê hestekî tamamî xerîbîyê bû.

Şekspîr dîsan xerîb bû dema di nava civaka îngîlîz de bi zehmetî rêve diçû. Di Hamlet de wêneyê kesayetên xerîb dikêşe beramberî hemû wan tiştên derdor).

(Gote) Yek ji wan nivîskarane ku di berhemên wî de jî xerîbî dihar hîskirin. Gote di şanomeya (Gerdelol) de (guntr) kirîye qehremanê şanomeyê, hewara ne razîbûnê pêve bilind dibû. Yan jî di şanoya (Fast) de li wî alî xerîbîyê de dijî. Gote di vê şanomeyê de wêneyê xerîbîya deronî dikêşand. Çawe di hebuna yek kesî de du can hebû. Nizane çawe yekê rizgar bike ji yê din.

(Brêxt) Elmanî jî di nava salên (1898- 1956) an de jîyan kirîye. Nivîskarekî dine hewildaye di şanomeya xwe de xerîbîyê derxîne holê. ((Peyva xerîbger cara destpêkê li cem Birêxt derket holê. Di destpêka Şanomeya (Serê bazneyî û Serê tîj) di sala 1936 an de belav kirîye)) ((Şanomeya Birêxt derbirînekî pêşengdar di derbarê qeyrana mirov a wî serdemî de dikir. Ku şaristanyetê amê û teknolojîyayê mirov têkdan.)) Birêxt ew misoger dike ku ew rastîya ku di cîhanê de hatîye xulqandin wisan kirîye bihayê mirovatîyê kal bibe.

Dîstovîskî, di navbera salên (1821- 1881) an de jîyan kirîye. Mînakek dine ji bo eşkerekirina peywendîya xerîbîya wêjeyî. Hewil daye di romanekê de hinek rewşên xerîb yên di nava civakê de eşkere bike. ((Dîstovîskî di berhemên xwede

⁷⁵ D. mehemed ebas yusif, *elîxtirab welîbdah elfenî*, weş nesir bexdad, 1987, r96 .

⁷⁶ W- Kemal xembar , *şekspîr hawcerxmane* , dazgâi roşenbîrî u blawkirdneweî kurdî , weş hela, bexda, 1986, r54 .

alîyê deronîya mirovan di parêze. Ne xwestek jî derdikeve beramberî civaka ku tê de jîyan dike).

Frans Kafkaî ê Elmanî, yek ji wan nivîskarên binav û deng ê cîhanê ye ku dinava salên 1883- 1924 an de jîyan kirîye. Kafka payekî bilind û cihekî tayber heye di nexşeya romana cîhanî û nivîskaran de. Ew î berhemek di çarêka sedsala 20 an de ku serdemê dewlemendîya rêxistin û cor bi coran de nivîsîye . Diberhemên kafka de hest bi xerîbîya deronî tê kirin. Romanên wî herî zêde li ser zilm û sitemane. Hemu romanên wî di yek babetê de derbaz dibe, ew jî xerîbîya mirovan a serdemêye . Giringtîrîn romanên Kafka pêktê ji (Kûşk, Dadwerî, Emrîka) Herwiha romanek din jî heye bi navê (Mesx) Romanên Kafka herî zêde li ser netewayetî bû em di karin di çend rewşan de bidîn destnîşankirin.

1- Dijayetîya bav di encama vê dijayetîyê de di nava civaka Yahudîyan de jîyanekî nexweşe û sadeye . Di wir de bavê xwe wekî nunerê zagon û civakê dizane. Di vir de xerîbîya kafka wiha derdikeve ku wisan dizane bavê wî nunerê civakêye. Ji ber wê jî kîn ji babê xwe girtîye û kîn ji hemû civakê jî girtîye.

2- Kafka dixwest jîyanê wisan nîşan bide ku tişteki pîçe û li cem wî bihayê wî nîne. Her wekî dibêj : (Ez hemû tiştan dizanim lê bawerîya bi çi nayê). Eşkereye ku di virde ji Gostaf Flûbêr bandor bûye. Ji ber ku Fluber jî di xwest pirtûkekê di derbarê pîçiyê de binivîse. Li ser van hemûyan re em nikarin cîhana Kafka wekî (Pîçgerî) danîn.⁷⁷ Her çiqas Kafak jîyan wekî tişteki hîç zanîye, ji ber ku ew jî ji dogehê ne zêdetire. Lê belê nefsawî rê neda ku wisan nîşan bide destê xwe ji jîyanê kêşandîye. Ev bixwe jî rewşekî xerîb be.

3- Rewşekdin a xerîbîyê em dikarin li cem Kfaka dîyar bikîn. Ew ji mirin bîrîye cem (Maks) hevalê wî wesyet kirbû. Her sê berhemên wî (Koşk), (Dadwerî) û (Emrîka) Heya ew di jîyanê de mabe belav neke, piştî mirinê binivîse û li nav bibe. Lê belê hevalê wî wesyeta wî bi cih ne anî berhemên wî belavkir. Hemû cihanê

⁷⁷ Safî hîdayt, , uhîmdadî huseîn ,ezîm umêdiu îsmâil zade, *jiyan u kesaietî kafka*, weş,serkewt silîmanî ,2002,r31 .

berhemên Kafka hevalê wî nîşanda. Ev daxwazîya Kafka ji hevalê xwe tiştêkî xerîbe. Ji ber ku berhemekî demekî zêde ji bo wê karkirîye û pêve westayîye çawe biryarê dide bi şewitîne.

4- Di salên dawî a jîyana xwede nêzîkî Berlînê jîyan Goşegirî hilbijart. Ji ber ku Kafka di ceribandîna deronîya xwede gehişt wê ku : Bê beş, tiştêkî kêr, li gel xelkê na goncê. Rastî li ber çavê wî windaye. Ev hemû bun sedemê ku Kafka jîyanekî bi tenê û durbe ji xelkê hilbijêre.

Kafka di berhemên xwe de perde li ser hinek rastîyan radike. Xwe di gendelîya dem û dezgayên hukmetê de dibînin ji wan Piştguh xistin û reftarê karbidest ne rêk, pîsîya defteran û destberdana serokê fermanberan . Rengdayîna van rewşan di romanên Kafka de nexwestekîya xerîbîya kafka a di damû dezgeyan deye.

Gelek romanê cîhanî nivîsîye. Bi şeweyekî eşkere li ser pirsgerêka xerîbîyê di sekine. Ji hemûyan binavtir romana (Xerîbî) a wêjeya Firansî (Elber Kamû) bû.⁷⁸ Kuln wîlsûn pirtûkek bi nav û deng di sala 1956 an de çapkir ku bi navê (Xerîb) bû. Ev pirtûke wan babetên ku hatîne linavbirin daye eşkerekirin. Wekî xerîb wateya wê çîye ? Ew sedem çîne bûne sedemê serhildana van dîyardeyan çawe wê derbaz bibe ji van dîyardeyan ? Tê dîyarkirin ku Wîlsûn di vê pirtûkê de xwestîye beşê xerîbîyê saxbike, û here kelha dîyardeya xerîbîyê. Sedem û fakturê wan jî bizane.

3.4.Xerîbî û Wêjeya Kurdî

Ji bo eşkerekirina xerîbîya di nava wêjeya her neteweyekê de pêwîste em agahdarê rastîya rewşa wê netewê bibîn. Hemû alîyên sîyasî, civakî , netewî û aborî.... Ji ber ku tendirustîya civakê li ser her yek van alîyan di sekine. Xerîbî di wêjeya kurdî de jî heyînekî herî dîyare. Em dikarin yek ji wan nîşanî hemû alîyan bikîn ku nivîskarê wê kurde, di mijarê xwede li ser xerîbîyê sekinîne. Eger em awirekê li rewşa bûrîyê gelê xwe bidîn, em ê bibînin ku di dirêjahîya dîrokê de gelê

⁷⁸ Ebdilemîr muhsin hude elteraz ,*elxurbe weilîxtirab fî el şîhir elkuîtî welbehrênî* ,risalet macîstêr ,merkez eldirasat elxelîc elarebî ,camîhet elbesre ,1989,r9 .

me di qonaxekî dijwar de derbaz bûye wekî dagirkirin, bûyer, Kuştin û xak dabeşkirin... Ev rewş hemû jî bandora xwe hebû li ser ziman, hizir alîyê aborî û civak û sîyasî.

Heskirina xwe ji bo xak û netewê ve digotin. Rihê fedakarîyê li cem kesên kurd çêbike. Lê belê ev hemû pêngavek bû di wêjeya kurdî de. Belku helbestvan û nivîskaran gelek alîyên dinjî nîşandayîne. Ne merceku ji derveyî welat jî bib. Mînak : Xerîbîya di nava xwe de û hinek alîyê civakê de.

Di jêr navê alîyê Rêbazî û piraktîka vê nameyê de, di vê tezê de emê bi kurtî û bilez behsa xerîbîyê di wêjeya kurdî de bikin. Ji ber ku di demên burîde nameyên akademî yên (Macister) di vî alî de ne hatîye pêşkêşkirin. Ku evjî nameyak di(Xerîbîya di helbestên Şêrko Bêkes) de sala 2001 ji alîyê (Şîrîn Seid Mihemed Seid) ve pêşkêşî Kolêja ziman a zankoya Silêmanîyê kirîye. Li gel nameyek (Xerîbî Di helbestên Kurdî de) bi kurmancîya jêrîn (1975-2000) di sala 2007 an de ji alîyê (Aram Mihemed Qadir) pêşkêşî Kolêja Ziman A zanyoka Silêmanî hatîye kirin. Eger em balê bidîn herdu nameyan di derbarê helbestan de ne pijayîye li ser janer û romanê. Bi çî şeweyan behsa xerîbîyê di romanê kurdî de nekirîye. Emê di vê Tezêde bi şeweyekî giştî behsa xerîbîyê di wêjeya kurdî de bikin. Bi helbest roman û çîrok.

Ji ber wê bi destxistina serdema xerîbîyê di wêjeya kurdî de dizivire ser çarîkên (Babe Tahirê Hemedanî) Babe Tahir di van çarîna de dibêjre :

Eger destim resed ber çerxî gerdun.

Ezan porsem ke ayn çûn ast û an çûn.

Yek radenê sed naz û nîemet.

Yek raqrsî cu aludederxun.⁷⁹

Di vê çarîna Babe Tahir de xerîbî û nerazîya beraberî wê dabeşkirina Yezdanîye. Babe Tahîr dixwaze vê ji perwerdgar bi pirse çima yek sed naz û nemet

⁷⁹dilzar gencîne, *Beşêk le cwarîne kanî baba taîerî hemedanî*,gorînî bo soranî ,dilzar gencîne,weş dezgaî aras,hewlêr,2007,r17 .

dayîyê û xwedê dayîyê dewlemend bûye. Yekek din jî bi hezaran derd û bi xwîna xwe parçeyek nan bi dest dikeve.

Çama helbestan Nalî ji derveyî welat bû Salim şandîye berhemekî dîyar û berçavbû. Em bikarin ji ber vê destpêka xerîbîyê di wêjeya kurdî de destnîşan bikîn. Nalî di vê çamêde bi dilekî birîndar, dure ji welat bi wefadarî dixwaze hewla xaka xwe ji salimê helbestvanê hevalê xwe bizane. Di heman demê dejî êşa durîya xwe ji bo salim ve gotîye. Dema ku dibêje :

Qurbanî tujî rêgetim ey badî xuş mrur.

Ey epykî şareza be hemû şarî şarezor.

Ey lutfeket xrfî hewa xwa hu hemdeme.

Wey sirweket be şaretû sergoşey huçur.

Omreke bemîzanî edeb tu hfe frûşm.

Zorm wit û kes tênegeyî êste xemoşim.⁸⁰

Di vir de Nalî xerîbîyê beramberî ne fêmkirina civakê ye. Ji ber ku valetîyek di nava wî û civakê de hebû. Ev valetî jî di encama ji bîrkirina Nalî û nizmî û pêşkeftina ku di civakê de çêbûyîye.

Her vê jî wisan kirîye ku nalî parçe karek hebe. Nalî lijêr navê neteweya xwe ewqas hewildan kirîye westîyaye. Lê belê ew ne di ferqa westana nalî de bûn hewil nedane jê fêmbikin.

Hecî Qadirê Koyî jî di helbesta (Le roma kewte ber çawim) di rêya hevpeyvîna xwe li gel kesekî kurd li durî welat. Wêneyê vê rewşa dijwar û xemgîn ya kesan dikêşe. Dema ku dibêje:

Le romawe kewte ber çawim kesekî heyam û heyran.

⁸⁰ Mela ebdukerîmî muderîs u faîth ebdukerîm ,pêdacuneueî mehemedî mela kerîm,*dîwanî nail* ,weş korî zanyarî kurd,bexda,1976,r56 .

Beheytt têgm kurde beşêweî ehlî kurdistan.
 Ke çûme xizmetî pirsîm : Birader xelkî kam cêgayî ?
 La kam la hatuy ? Gra gotî : Baban ! gotim : Baban.
 Dilmdawe gotim : Bawke hemuman bêkesîn lêre.
 Çi qewmawe gelê heyfe, megirî her wekû baran.
 Gotî bu xorbet rutî nîye efxan û hawarm.
 La daxî hakimî xome, le şam û şewketî turkan.
 Gelekê bîstume pestî û bilendî dewletan,emma.
 Cîhan neydîwe pestîw wa mîsalî halî Kurdistan.⁸¹

Di vir de xerîbîyekî coxrafîye, jiber durketina helbestvan ji nîştîmana xwe.
 Xerîbî civakîye helbestvan dixwaze bêje xelk çî şeweyan ji cihê civakê ne razîye.

(Mehwî) helbestvan jî yek ji wan helbestvanane ku di rêya helbestên xwede wêneyekî din yê xerîbîyê kêşaye. Mehwî di helestên xwe de pişt bi sembola sinê xwe ve girêdide. Xerîbîya wî jî herî zêde xerîbîya civakî û sofîgerîyê ye. Mehwî di helbesta xwe de dibêje :

Qatî pîyaw Leser em erze,debînî mensor.
 Beserî darewe(Jalnone) lebin zîndane.⁸²

((Li gorî mehwî zilamê rast li ser xwezayê bi dest nakevê. Ewa tu bî zilamî têdeye, Wekî helac li sêdarê daye yan jî zenon xistîye di nava zîndanê de)) . Mehwî, li gorî wî wateya peyvê ne tişteke pê bê gotin . Zilam di nava civaka xwe de heyîna wî heye. Eger hebe jî bi êş û îskencê ji nav hatîye birîn.

Hêmin ê helbestvan ew keseye ku xwenê bi azadî û serbixweyîya Kurdistanê û welat dibîne. Piştî wê ji ber barê sîyasî ji welat koçdike û li Ewropa di sekine. Êdî li

⁸¹ Serdar hemîd mîran u kerîm mustefa şareza,pêdacuneueî, meshud mehemed ,hacîqadirî koi,weş emîndaryetî giştî î u roşenbîrî lawanî Kurdistan,1986,r91 .

⁸²Mela ebdulkerîmî muderîs u mehemi mela kerîm Lêkolînu lêkdanewî ,dîwanî mehwî ç2,weş korî zanyarî kurd ,bexda 1977,r34

wir xwena azadîya xaka xwe dibîne, herdem wekî rêbarekê tê ber çavan. Hêmin her dixwaze heskirinê ji bîr nekin dema ku dibêje :

Lew demî da giwê heldexen bû tarî.

Lew demî da (Mamlê) delê qetarî.

Yadm ken yadî min dure wilat.

Yadî min rêbiwarî rêgaî xebat.⁸³

Qedrî Can ê helbestvan ew jî mînakek dine ya di nav helbestande. Di encama durîya ji xakû neteweyê êşek di deronîya wî de radibe. Ew jî bi zorê ji kesûkarên xwe dur ketîye herdem hêvî daxwaz kirîye. Ev durî bi dawî were, bi zivire hêmbêza nîştîmana dayîka xwe. Qedrî Can . Reşbelek _ Name heskirina xwe ji bo xak û nîştîmanî yê misoger kirîye. Eger zorî neba welatê xwe ne dihişt û ne diçû. Dema ku dibêje :

Gerçî ez durî we me, îro erê...

Lê bi dil ez ba we me, mîna berê.

Hun dizanin ez ji bo çî durketîme.

Her çî zana dizane vê xeberê.

Ez evîne şekirê şamê nebûm.

Lê ji ber jana ku dabû cigerê.⁸⁴

Wekî ku me behskirî bi kurtî û zu behsa xerîbîyê di nava wêjeya kurdî de dike. Ji ber wê nabe di hemû qonaxande kesayetîyan werbigirîn.

Roman bi giştî di rojhilata navîn de li herêma Kurdistana iraqê bi şeweyekî taybet hunera nûye. Gelek faktorên Dîrokî, civakî û sîyasî peywendîya wanbi rewşa wê navçeyê ve hebû. Di paşxistina serhildana vê hunerê de girtîye . Ji ber wê jî di wêjeya kurdî de dîroka xerîbîyê di helbestan gelek pêşîya romanana ketîye.

⁸³ Dîtwanî hêmin ,*sercem şîhrekani mamosta hêmin* , pexşangaî azadî ,2708 î kurdî ,r333.

⁸⁴ p îzedîn mustefa resul, *Kokirdnewe u pêşekî u perawêz* , qedrî can 1911-1972,weş u ofis asa ,suleîmanî 2002,r77 .

Romana Janî Gel ku Îbrahîm Ehmed di sala 1956 an de nivîsîye. Lê belê di sala 1972 an de belavkirîye û gelek babetên girîng yê wê serdemê destnîşan kirîye. Ji wan jî xirabîy desthilar, Rejîm, hebûna cîyawazîya çîneyetî û paşketina civakî di alîyê civakî debû. Mînak : Nivîsê bişeweyekê li ser zimanê Pelewan û camêrî dibêje Eger kur be pêwîste aheng jê re bê kirin. wisan xwe rizgar kir ji hizir û bawerîyê kevin girtî. Belku jin ew qas gazindan lê neyê kirin ku kuran ji keçikan zêdetir hesdike. Em dizanîn bi taybet jin li cem çiqas hatîye bindestkirin. Di rêya romana xwe de ev rewşên civakî derxistîye holê. Ev jî belgeyeke ji bo xerîbîya nivîskarê vê romanê. Heya niha jî civaka me nekarîye xwe ji van rewşên ne şirîn rizgar bike. Di encama van rewşande encamên nerênî çêdibe li ser pêşerojê. Eger tu tenê ji çêbûna kur hes bikî û ji çêbûna keçê rikê bi girî, çawe dikarî di pêşerojê de ji bo hemû kurekê keçekê bi xwazî ?Evan biryaran wisan kirkû çavlêkirinek di çêbûna kur û keç de çêbibe.

(Hesîb Qeredaxî) yê helbestvan, yek ji wan helbestvana ye ku bi rastî hizirîye û hemû ew karên ne rêk ret kirîye û dijî wan kesan bûye. Dema ku dibêje:

Katê mirov debê be seg.

Hewar bû halî segekan.

Çlkaw xorî dîwexanek debêt bebeg.

Hezar rehmet le begekan.

Awî çawim debêtûdilm pir ken le firmêsk.

Gwêçkem biken be kulane.

Hîç dur nîye le demimda ziman bibê be gemal û danekanî be tutele û

Lêkîş bibê be rupakî.

Jiyan xoî u çemkekanî le pêş çawî birînimda

Debin şîne boşayî.⁸⁵

(Hisên Arif) di çîroka (Gele Gorg) da ku di sala 1983 an de nivîsîy, hinekrewşên xerîbîyê dîyarkirîye. Yek ji wan jî pêşketin û alîgirtina kese. Di

⁸⁵ Hesîb qeredaxî *ferhengî xem3*, weş dar selam ,bexdad, 1989,r26 .

encamekî ne guncaw de li gel civakê çêdibe. Ev çîroke behsa Baram navekê dike ku kesekî rewşenbîr û derketîyê Amadeyîya Kîştukale. Ew kese nikare li gel civakê rêve biçe ji derdora xwe acize. Baram biryar dide li gel Ays a hevjinêna xwe û du zarokên xwe durî xelkê xanîyekê çêbike. Heya destê gorîyên du pê ne gehe wan, ji xirabîya wan dur be. Armanca wî di memleket de xanîyekî biçûk durî xelkê çêbike. Piştîre buyer bi vî awayî dirêj dibe. Heş mehan di wî xanîyê durî xelkê de dijîn Heya di zivistanekî sar û sir de.

gelek gorî êrîşî ser mala wî dike, wê şevê ji destê wan gorîyan gelek nexweşî dibîne . Ev jî wisan dike ku baram bi neçarî bi zivire nav civaka gorîyen du ling. Armanca wî ji wan kesên ku di nav civakê de nikare li gel wan hewil bide . Di vir de tê dîyarkirin ku baram li gel xêzana xwe bi neçarî ji nav civakê derketin. Ji ber ku xerîb bûn. Lê belê ya ji wan dijiwartir ewe ku ji tirsê êrîşa gorîyan neçare here di nava civakê de.

Hisên Arif di romana Şar de ku di sala 1986 an de nivîsîye, bi şêweyekî rastî bi dariştinekî hunerî behsa dîroka serdema bajarê Silêmanîyê dike. Di vê romanê de hest bi şerê dinava xelkê Silêmanî û rejîmê de tê kirin. Têde rejîm wekî çavderekî serkuter temaşeyî xelkê dikir. Herkesê ku tê de dijî û berjewendî û biryar hemû di çavdêrîya wan debû. Êş û îşkenceyê dide wan têkdide. Ew corê xerîbîyê ya ku di vir de derdikeve holê (Xerîbîya Desthilat bû) .Di vê romanê de behsa wê dike ku grupek dest diavêjin çekan li dijî rejîmê di sekinin û biryarê didin herin çîyan. Lê belê piştîre tîn kuştin. Kuştina wan li cem xelkê ne asan bû((Ne hêsan bû, xelkê tenê ji bihîstinê bawer ne dikirin. Ji ber ku licem wan sitem bû grupek çekdar zîrek ku bisalan li çîyan dijîn , henekê xwe bi mîr dikirin wisan ne asane hemû bê kuştin !) .⁸⁶ Ewan çekdaran ne dikarî di nava civakê de bijîn ku ji alîyê rejîmê ve bên girtin. Biryara çûyîna çîyan ya van pêşmergan ji ber zulm û zordariya rejîmê bû.

(Mal awa gulî xem) ew kurte romaneye ku di sala 1988 an de ji alîyê (Hîmdad Hisên) ve hatîye bivîsandin. Evromane behsa heskirina reftarê di nava kurek

⁸⁶ Husên arif ,*şar,roman,c1,govarî*, karwan,1986,r115 .

û keçekî ya zanîngehê dike. Navê lawik Dilêre xelkê Hewlêre, Keçik jî navê wê Neşmîle xelkê Silêmanîyê ye. Piştî demekê dilê wan dikeve hev. Piştî derbazbuna wext keçik ji dayîka xwe re dibêje, piştî bavê wê jî dibihîze. Lê belê piştî bihîstina bavê wê peywendîya wan rastî pirsgirêkan tê. Piştî wê lawik çend cara xwastina keçikê dike Lê belê babê keçikê qebûl nake dibêje Qebul nakim carek din bîn. Fêm nakin çîye ? na bêjin: Wileh bidim seyan ez nadim we Ev rewşa xerîb divir de derdikeve holê ku keçik ji alîyê bavê xwe ve gelek tê heskirin. Lê niha di cihê wê heskirinê derik kîn girtîye. Êdî hemû derdor di asta keçikê de dibin dêwezm û hemu gazinda lê dikin. Piştî bavê wê êrîş liser dike û dixwaze li gel yekîdin bi zewice dema ku dibêje : ((Eger li gel vî pevjînê neke êdî zewac nîne heya serê wê spî dibe))). Piştî keçik bi zorê didin xwedîyê kargehekê. Piştî keçik jehrê dide mêrê xwe û dikûje. Piştî re keçik direve diçe cem Dilêr. Piştî her du tî girtin li dadgehê dilêr kuştina zilam dike ser xwe. Ji ber ku heskirina wî ew zewt kirîbû. Dadgeh jî sezayê 10 salan jê re dibire. Ew xerîbîya nivîskar di vir de eşkere kirî xerîbîya di nava civakê deye. Ka çawê heskirin dibe qurbanê biryarên pîs yê civakê.

Romana Helkêşan bero lutke ya (Ebdula serac) Yekek din ji wan romana ye ku nivîskarê wê behsa cih hiştina xakê û penaberîyê dike. Ev romane behsa wê dike xelkê bajarê Kerkukê didirêjîya Sedsala 20 an de rastî destê îngîlîz Osmanî û behsîyan bû. Roman nivîs di vî romanê de wiha behsa girtina kesan ji bo xakê dike, dema di romanê de dayîka newzad dibêje Binyada min li kur çavê xwe vekir her li wir dil vedike û canê wî pêdihesê. Dem diçim wî alîyê hasm çavê min bi kolanê Seyî Serewe)) di keve. Yekser hemû jana zarokatîya min tê ber çavê min. Hest bi heyînekî nu dikim ku ew heyîn di cihekî din de nîne !)) .⁸⁷ Nivîskar di vî romanê de misogerîyê li ser vî corê xerîbîyê dike. Ew jî (Xerîbîya Coxrafî) ye.

(Hisên Arif) di romana (Endîşeyî Mirovêk) de behsa kesekê dike, ku navê wî (Sebrîye). Karakterê serekî yê wê romanê ye. (Ev kese ji civakê xerîbe. Helwestek din beramberî civakê wergirtîye. Ji ber ku hest dike peywendîyekî rihî bi

⁸⁷ Ebdula serac ,*helkêşan bereu lutke ,roman ,dezgaî roşenbîrî u blawkirdneweî kurdî ,weş dar elhurîe,bexdad ,1989,r28 .*

civakê re nemaye. Xerîbîya sebrî tenê di çarçuveya goşegirîyê de namîne. Sebrî dayîk û bavê xwe wekî tewanbar dizane. Ji ber ku ewan ew anîyê vê jîyanê ku ne bi xwesteka wîye. Her ji ber vê jî nikare li gel vê cîhanê bi guncêt. Di derbarê hemûna sebrî de komek pirsyar li cem wî çêbû. Dema ku diçe ser gora dayîk û bavê xwe dibêje: ((Dayê...! Babo.. ! Ez hatîme pirsyarekê ji we bikim. Hêvî dikim hun bersiva min bidin. Ji ber çi pêwîste cihek hebe ez li wirbim û cihek hebe ez biçimê ? !... Min fêmbikin ji ber çi ? . Demekê li benda bersiva xwe ma. Her li bendêma lê bersiv nebû. Bi acizî û westanê re xwe pişt de xist û rakêşa))⁸⁸ Ev corê hizirîna sebrî

rêkeft û hizirîna ji ber hebûnê wî bû. Ji ber ku wan jî heman pirsyar gotîne. Dema dibêje: Dema em ji dayîk bûyîn pêwîste bi mirin jî jiber çi em jidayîk bûyîn ? ! Em dikarin xerîbîya sebrî li ser sê coran cuda bikîn ku evin : (Xerîbîya kesî, Xerîbîya hebûnê, Xerîbîya derdor).

Di (Derbedî Pepole) ya (Şêrko Bêkes) de hest bi xerîbî û tenêbûnê tê kirin. Helbestvan rastî xeyalekî yutupî dibe Nalî bi asanî li ser dibêje, Br- ba- ya ku ji vê xerîbîyê û durîyê rizgar bike : Dema ku dibêje :

Eger carcar " ba " helbikat.

Raekem bû çendisatê eçime berî.

Elêm beşkû em careyan,

Na em " Ba"ye.

Wekî reşebay silêmanî.

Be pirtaw bê û helimbigirê

Tozî xol bikate çawim.⁸⁹

Dema ku helbestvan ev helbeste nivîsî li tarwge bû. Hest sozê xerîbîya jîyanê hemû dagirkir. Di vir de helbestavan xerîb bûye bi wê xerîbîyê ew cihejî ne karîye wisan li helbestvan bike, herdem hizra xwe dike. Di vê helbestê de hest bi xerîbîya coxrafî tê kirin.

⁸⁸ Husên arif, *endêşeyî lvovêk roman*, weş beyh, bexdad, 1990, r251 .

⁸⁹ Şêrko bêkes *derbendî pepule*, c1, weş bêsarani, suleîmanî, 1998, r134 .

(Bextîyar Elî) jî di helbestekî bi navê (Wentezu îşî musîqayekî mandû) de xerîbîya xwe a ji bo nîştîman dîyar dike. Ev helbeste êrîşekî hişke li ser nîştîma dema ku dibêje:

Ey nîştîmanî xayînan
Ke min be seyrî gul de mirim, bum be biroskek dem kujê ?
Weten ew qewtuwe şikawey pire le baran û jeng
Weten ew kase xalîyeyê pire le paşmawê jehir
Min hewardekem⁹⁰

Di vir de tenê em xerîbîya helbestvan (Bextîyar Elî) beramberî nîştîman didin dîyarkirin. Lê belê ne şerte ku me jî heman raman hebe ji bo nîştîman.

Weten ew sentoreî şikandîy sonata trsawekanî kuşt.
Min pîyanûm gulim lêdeda.
Mîlûdî giyam le pêdeştekanî çakdekird.
Beyanîyan behar be kêlgeî genimda derûyştîm ê
sunb^y le xewtuwekanm bu eşq amade dekird.
Weten minî legel xunçekanda derkrd.
Min ke îqaeî bam legel ruhda.
Dengî gerdelolim legel lêdanî dilda rêkdeexist.
Eî weten meftunî tûm.
Belam namewêt şêwem tembîr bikewêtewe.
Weqtî xerîbî û xurbet, wam be kûtê xutewe.
Ey nîştîmanî bêşerefan.
Ke min be goranî demrim, bû be xencer demkujêt ?⁹¹

Di vir de helbestvan, acizîya xwe a di derbarê nîştîmanê de derdixe holê. Nîştîman wekî bîyanîyekê dide dîyar kirin û ew bîyanîye jî têxe jêr rehmeta xweda

⁹⁰ Dîwanî hêmin ,*sercem şihrekanî mamosta hêmin* ,weş azadî 2708 kurdî,r93.

⁹¹ Bextyar elî ,*ta matemî gola xuênî firîşte* ,koî berheme şihrekanî (1983-2004)weş renc ,silîmanî ,2006,r532 .

de. Ev amadeyî jêr navê nîştîmanî deye, dijiminê nîştîmanê jî têxe jêr pêlava xwe . Her çiqas nîştîmana xwe xistibe jêr pîyan de di virde xerîbîya xwe dide dîyarkirin. Lê belê naxwaze nîştîmana xwe jî ji bîr bike.

Heyîna koçkirinê di salên 90 tî ya sedsala bûrî de derket. Heya niha jî li gel wêye û hîna jî berdewame. Di encama nehamefîyekî li pey yek de neçarî xelkê bûye. Tê dîyar kirin ku ev îfadekirine civaka kurdî bi giştî helbest nivîsan jî ji vî karî aciz bûne.

Qubadî Celî Zade yek ji wan helbestvanane di helbestên xwe te evvegotine dîyar kirîye. Dema ku dibêje .

Hemuşman le nîştîmanî bê nan û maç.

Bêzarîn

Em êwareye diwa tewqe legel yekda dekeyn û malawa.

Keçî le ser sinore serman birduwekan

Le naw belemî bêser û şiwênekan.

Le pekkewtuxan

mutaşxane wmeîxane û mêxane syahyekanî.

Ewrupada

Pêkdegeynewe.⁹²

(Ezîzî Mela Reş) di romana (Xak û Çewsanew) behsa pirsgerêk û şêrê di navbera cenga cîhanê a yekem dike. Bi taybetî sala (1917-1920) di vê romanê de behsa wê dike ka çawe Îngilîzan xêr û bêra welat ji xwe re dibin. ((Îngilîz çend sala destê memleket dagirtîye, xêr û bêrê dibe û miletjî xistîye ser sacê elî. Di xwaze bi dabeşkirina di her navçeyekê de çemd kesên navdar piştgirîya desthilat daran bike ji bo pêşerojê de bibin piştgir)).⁹³ Roman nivîs di vê berhemê de behsa şêrê di nava

⁹² Qubad celîl zade ,*hemîşe ru le xuda hemîşe mest* ,weş beste,sulîmanî ,2001,r150 .

⁹³ Ezîzî melaî reş ,*xak u cewsanewe,roman*, weş wezaretî roşenbîrî – hewlêr,1998,92 .

çîna cotyar û axan de dike. Her wiha behsa rewşekê dike ku çawe hinek ji cotyaran xwe wekî xwedîyê axan dizanin. Hemû tiştek ji bo axan rewa dîtîne. Di vir de roman nivîs corekî yê cerîbîyê dîyar kirîye ku ew jî : (Xerîbîya Civakîye) Mînak : Cotyarek dibêje : (Heya birayê me yê mezin sekinîbe ev zevîya me ji bo çîye ?). Yan jî di cihek din de dibêje: Kurmanc û zevî ne gotîye .

(Şêzad Hesên) jî yek ji wan nivîskaran bû ku rewşa deronîya xerîbîyê bi taybet di berhemên xwe de ragihandîye. Nivîskar di çîrokên xwe de misogerîyê li ser xerîbîya pelewana dike. Mînak : Şêro yek ji kesayetên serekî yê çîroka (Tebluyekî Ne tewaw) e. Şêro di çîrokê de acize ((Şêro xerîbîya wî a xwezayê ye ew xweza jî pire ji tirs û dil recifînê. ((Tif li vî zemanî kuran bi cahêlî himbêza germ ya dayîka xwe bi cih dihêlin.))⁹⁴ Di virde çîrok nivîs wêneyê gelek tarwgeyan kêşandîye. Bi neçarî xaka xwe a pîroz bi cih hiştîne. Ka ev ji ber tirsê rewanî bû yan jî ji ber giranî û baştirkirina jîyana xwe bûn. Ev jî xwendinekî zu û kurd bû ji bo peywendîya xerîbîyê bi wêjeya kurdî re.

3.5. Berhevkirina Xerîbîya Her Du Helbestvan

Nave û berhemên her du helbestvan wekî Seyîd Mihemed Emîn Şêxê îslamî kurê Seyîd Hesênê Şêxê îslamî ya Mokrî.⁹⁵ Ji tureya mela camî çorî. Pêşî 300 salan hatîne Sablax, binemalekî mezinin di vê meydanê de pêkanîne. Dayîka wî navê wê Zeyne ba keça Şêx Burhan bû. Niha jî binemalekî mezin ya Mokiryane. Bihara 1921-1986 an bi şev li gundê Laçîn nêzîkî Sablax ji dayî bûye. Jîyana Hêmin cudaye ji jîyana xelkê ya hatî nivîsandin. Ji ber ku jîyana xwe bi xwe nivîsandîye. Wekî behs dike dayîka wî gelek caran li çavê wî daye û dibêje: Tu pêweqedemê reşî, dema tu ketî zigê min, min laşekî sax yê xwe ne dît. Nexweşî yê ez girtim.

⁹⁴ Helmet baîz resul ,*rehênî derunî le çîrokekanî şêzad hesenda*, nameî master ,zankoi bexda, kolêjî perwerde, îbin ruşd ,beşî zmanî kurdî ,2006,r152 .

⁹⁵ - Diîwanî hêmin ,sercem şihrekanî mamosta hêmin , pexşangaî azadî ,2708 î kurdî ,r20 .

Li ser heyv û roja xwe bûm ku neçar bûyîn em herin ladê. Hêmin dema behsa jîyana xwe dike jinek û zilamekî hejar bi dil û can ew xwedî kirîne. Ewan gelek jê hesdikirin. Hêmin jî ew wekî dayîk û bavê xwe hesdikir. Zimanê wan wekî bilbil di zanî, ne dizanî ew zimanê tirkî bû yan jî Azerî bû. Merdbûna vê jinê wekî ku Hêmin bi xwe jî behs dike; yekem car bî hişk bû ku bi hestên nazik yê zarokatîyê ketîye. Ev jî yek ji bîranînên herî nexweş ê jîyana mine. Di vê rastîyê de ez du caran sîwîmam du caran dayîk û bavên min mirin. Carekê bi zarokî û carekê jî bi pîrî. Hêmin behsa bavê xwe dike ku kesekî dewlemend bû. Navê wî ji camêrî û destê wî belav bûye. Di destpêkê de helbestên wî li jêr bandora du beşên wêjeyî dene. Her wekî helbestên helbestvanên kurd pêşîya 30 40 salan bandora wêjeya Farisî li ser helbestên wan dîyar bû. Herî zêde helbestên wî ji helbestên Eruzêne. Wezin û qafîya helbestên wî li gel destora helbestên farisî bi rêk diketin. Di alîyek din de jî helbestên helbestvanê kurd ê binav û deng (Nalî) jî bi xwe dibin bandora helbestên Kîlasîkî yê farisî debû.

Bandora wê jî li ser helbestên Hêmin jî kirîye. Ji ber wê jî didestpêkê de Hêmin helbestên xwe bi şeweyê Xezel û Qsîdeyî çêdikir. Carna jî Mesnewî û du beytî jî tê de hebûn. Piştî helbest gotinê, Hêmin hêdî hêdî berbi wêjeyê resen a kurdî ve diçe.

Xwe ji qafîye û weznê helbestên kîlasîkî rizgar dike. Helbestên wî wekî besteyên kurdîne. Besteykî di çarçêweya dariştinê deye. Helbestên kurdî û zimanê kurdî ji tengîyê rizgar dike.

Di helbestên Hêmin de eşkere dibe ku di jîyanekî pir zehemt dîtîye. Xwe nêzîkî kesên buyer serde hatî zanîye. Felsefeya jîyana Hêmin ne ewe ku rune û ji durve temaşeyî jîyan û xebata gel bike. Ji bo xwe û ji bo gel helbestan bêje. Hêmin ew rastîye qebûl kirîye erkê helbestên helbestvanan zorîya gel dîyarkirine û xistina wan ya di nava malikan deye. Dikare beramberî hejarî, xerîbî bê beşbûna ji gelek tiştan be. Ev jî di nava rastî û ne rastîyê de. Di nava heq û ne heqan de rasîyê hilnebijêre.

Ji ber wê jî hêmin ne tamaşevane û nikare wekî tamaşevan bimîne. Her di wan salan de Hêmin rastî Xerîbîyê tê ji ber hizrê azad û xebata gelê xwe, rastî derdekê tê û heya demekê ji welat derdikeve. Eşkereye ku rewşa sîyasî bandora xwe li ser helbestên Hêmin kirîye.

(Babirdele) de dibêje:

Minîş ey bilbil bendî wekû tûm.

Weha durm le hêlane û gulî xom.

Minîş wek tu le kîsm çûwe gulî sor.

Minîş hêlanekem lêkirawe xapor.

Minîş babrdelî ber gêjelokem.

Demêk lew qolke, tawêk lew çlukem.⁹⁶

Ew acizî û reşî çarenûsa helbestvan di helbestên din de jî her berçavan dikeve. Heya sala (1959) her berdewam bû: Dibêje :

Eger xermanî eumrm êstekanî pakî ba bîba.

Be mergî tu miçurkîşm be dilda naye babîba.

Hemu emruî ebed têyda nîye xoş demêk mestî.

Xidir awî heyatî bû çibû ? Ferî şerbaî ba.⁹⁷

Di (Nasûrî Teşna) de ji jîyana rastî revî. Ew heqîqeta ku helbestvan rastî hatîye naxwaze qebûl bike. Bi temamî dîyare ku hêza wê nîne jîyanê bi goherîne. Rêya wî nîne xwe dur bixe, di xwaze bireve.

Wbe yarmetî meî rû le dunyayekî xeyalî deka

Çûn nebem bu meî û meyxane pena, têgeyûm

Lew wilate hemû şit zore, benî adem kem

Şerebaye le çîyakan û hewa tuşe dena

Weku şeytan demewîst ru le çyaî estem kem⁹⁸

⁹⁶D.şakir nurî ,elîxtirab fi elfikir elmarkisî ,ko,elhîlmî eltequmî,j2,weş hurîe,bexdad 1984,r28 .

⁹⁷ D.h. sercem şihrekanî mamosta hêmin ,weş azadî 2708 kurdî,r12.

Jîyaneke, helbestvan xwe jê dur digire, ev jî di encama xorbetîya ku tê de dijî ye. Lê belê helbestvan qet wextekê meî ne xwarîye ji ber ku di destpêkê de jî ne xwarîye.⁹⁹

Bedir Şakir Al Sîyab, di sala 1926- 1964 an de ji dayîk bûye. Ji xêzanekî mal begî bû ew jî hoza (Ebû elxesîbe) gundê Cîkur. Xêzana Seyab cudabû ji xêzanên din. Xwedîyê dîwanxaneyekî mezin bûn, gelek xelkan qesta binemala wan dikir. Di alîyê aborîyê de jî xêzana Seyab xwedîyê milk û malin. Seyab jî dibê je ew xwedîyê baxçeyan bû gelek karkaran di nav de kar dikirin. Di alîyê rewşenbîrîyê de jî xêzana wan jê ne durbû . Lê belê ji ber bêbextîya Seyab û Hêmin ew bê par ji wê dewlemendîya xêzanên wan.Seyab rojek ji rojan heyînî ne dîtîye her nebînî dîtîye.¹⁰⁰ Ji ber vê sedemê jî helbestek nivîsîye bi navê (Mnzl Alaqqan). Piştî dayîkbûna Seyab malbata wî rastî pirsgirêk, qeyran û deyndarîyê dibe.Piştî rastî nexweşî û dest kurtîyên hatin dibêjin sedemê Seyab bû. Ew jî li karekî hêsan digera da ku jîyana xwe pê berdewam bike. Di helbestên wî de eşkere dibe ku xema zarokatîyê xwarîye. Piştî rastî nebûnî bîrsîtî nedîtîne tê û dibêje :

Asmee îbkî, înadînî
 Fî lîlî alstuhd alqars
 Ydû abî kyf txlînî
 whdî bla hars...?
 Xîlan lm ahcrk en qsd
 Alda yaxîlan aqsanî
 Anî abkî mslma tbkî wıstşr alyl ahzanî
 Fklma mr nharatî
 Lyl mn albrd
 alftnî ahsb maqd fl fî cybî mn alnqd

⁹⁸ Dîwanî hêmin ,sercem şîhrekanî mamosta hêmin ,weş azadî 2708 kurdi,r27.

⁹⁹ Hevdîtî ji mehmed ebdulkerîm muderîs,kat 10 şev ,berwar 1-12-2015 .

¹⁰⁰ - medenî salih, haza hue al seyab, dar elreşîd lilnşr,bexdad 1981,r12.

Aştrî hja alqlîl alşaw ? ¹⁰¹

Hêmin bi xwe dibêje : Dayîka min gelek caran li nav çavên min dida û digot: Dema tu ketî zigê min, min laşê xwe yê sax nedît. Nexweşîyan ez girtim. ¹⁰²

Li ser heyîv û rojan bû ku neçarbûn em biçin û herin ladî.

gelek qsem le dila bû hikayetim mabû

keçî le bextî keçim xame nukî lêre şka ¹⁰³

Hêmin caran bi kenîn di got dayê guneha min çîye ?

Xorbetîya Seyab ji cîkorê destpêdike " Di alîyê civakê de dibe rê xweşker (Ji bo vekirinê ku teji ye ji êşan, nerihetî û nexweşîyan, Di nava cergê wê xwezaya ku seyab tê de jîyayîye ev dîyardeyên xerîb ji dayîk dibin ¹⁰⁴. Di helbestekê de wesfa xwe dike û dibêje :

Wahî elkîyan kan xgba hdh

Jawî Alşfah alkul mîtnhd

Whu alegl mn qwam farx

îsbî aleyun û wcne tturd. ¹⁰⁵

Eger seyab kesekî asayî be wê di koşeyekî ê civakê de runişt, bi bê dengî navê wî ne dibû. Seyabê hozanvan diçe ser mînberê û ji hemu heyînan derdikeve û cihekî ciwan ve dike. Ew nexweşik bûna rumeta wî gelek aciz kirîbû. Gelek caran di vir de jê tê bihîstin. Nikare xwe jê bide paş yan jî pişt goh bavêje . Ev babet tenê ji bo wêye bibe çavkanîyek a xerîbîya Seyab. ¹⁰⁶Ji bilî van jî sedemekî din jî heye wekî wefata dayîka wî ku ew jî di temenê şeş salî de bû. Sozekê ji dest dide ku gelek pêwîstîya wî pê hey .

¹⁰¹ Ehmed şefîq, heyat elseyab, we muhanatuhu, weş elnesir, besre 1974, r34.

¹⁰² -D.h. *sercem berhemekanî mamosta hêmin* , tarîk u run , weş hewlêr 2014, r16

¹⁰³ *Diîwanî hêmin , sercem şihrekanî mamosta hêmin* weş azadî , 2708 kurdî, r85 .

¹⁰⁴ - Ehmed mehemed fituh , *waqeh elqesîde elerebîye* , weş dar elmeharif bî misir , 1984, r35

¹⁰⁵ - Ehmed mehemed fituh, r40 .

¹⁰⁶ - Ebducebar dawd , *bidir şakir elseyab, raîd elşîhir elhur* , bexdad , weş seqafye, ç2, 1986, r42

3.5.1.Jin le hizru bînîa hêmin u seyab

Sêwîtî di jîyana helbestvana de ji xalekî hevbeş pêktê. Wisan bandora xwe di cihde dihêle di çêbûna durîtîyê de. Karekî kure di karên wêjeyî de gelek caran ev buyer derdikeve. Sêwîtîya helbestavan cîyawaze ji mirina bavê wan. Mînak : Seyab di temenê şeşsalî de dayîka xwe ji dest dide. Dibêje: " Ez hîna zarokek biçûk bûm min dayîka xwe ji dest da, bi vê re ez dur ketim ji heskirina jinekî mezin "

Di jîyana Sîyab de mirina dayîka wî û şeş salîya wî nayê veşartin. Ji ber ku zarok gelek ji dayîka xwe hesdike.Ew jî di cîhana dayîka xwe de jîyanê berdewam dike û jê durnakeve, eger di beşekî kêm de jî nebe. Di encama mirina dayîka sîyab de xemekî dirêj na hêle. Çend caran bîranînên dayîka xwe di helbestan de behskirîye. Piştî mirina dayîka xwe xalekî serekî ji bo bêbestîya jîyanê datîne.Bêbeşbûna wî ji soza bavê wî jî:

Abî... mnhqd crdtnî alnsaw
wamî... gwaha alrdî alecl.¹⁰⁷

Armanca heskirin û helwesta helbestvanan beramberî jinê piştî bandora sêwîtîyê bû. Di encamê de ji destdayîna heskirina sîyab ji bo dayîka xwe û ji destdayîna heskirina Hêmin jî ji bo bavê xwe. Ji ber ku heskirin di nava mirov û sing deye. Helbestên helbestavanan heskirinê didin dîyarkirin. (Di heman demê de ne xwesteka rihîye û laşîye). Her du jî piştî heskirina xwezayê dizivirin dilê jinê û xwezayê. Lê belê biryarên jîyanê rêgirê wan sedemane ku ew behsê dikin.

Bê goman Sîyab tenê tenê laşê jinê naxwaze, belku rih û laş bi hev re di xwaze. Ji ber vê jî tenê du rê li ber wî heye. Yekem : Axafîtina ligel keçê, ku helbestvan di xeyalê xwe de mînakekê çêdike.Duwem : Rêyek xirap ji bo tejkirina valetîyan . Her yek ji van rêyan awaze û ne temame ji bo tejkirina pêwîstîyên helbestan ya ji bo laş û heskirina jinê.

¹⁰⁷ îhsan ebas , *Bedir şakir elsyab*, îhsan ebas ,beîrut,1969,r68

Ev helbest Sîyab pêşkêşî helbestvan Elî Mihemed Gh Alhndsî kirîye. Belgeyekî mezine li ser rekabet deronîyê bihêze, li cem Sîyab. Herwiha hewldaneke ji bo hevsengîya di navbera hunera rihî û laşî de:

Alcsm lula ruhî lm yfsd
 Fhî altî srxt bhan îetdî
 Waja alrdaw tdnst aranh
 fajnb jnb alrtdî .¹⁰⁸

Carekê xwesteka ruhî bikar anîye:
 Ef alxram bhsbhm hbh .
 Nvrayef en ala pam ybed.¹⁰⁹
 Carek din jî xwesteka tewan bikar anîye :
 Tlk aldmaw bqlbh altçrm
 Tflî ftdfh csmh almapm.¹¹⁰

